


# ROJANÛ

*kovara huneri çandi û edebi*



25  
1989

## NAVEROK

Xweparastina Îsmail Beşikçi ya yekemin (1).....	3
Ebdullah PEŞÊW.....	6
Temaşegeha Wênekarên Kurd - Marina Eziz.....	8
Jî Diroka Kurdistanê - Ewliya Çelebi.....	10
Çend Çarin - Barani.....	15
Dr. Ebdurehman QASIMLO.....	16
Sistema şaxê stranên gelêri yên Kurdên Ermenistana Sovyet -Nûra Cewari.....	18
Welatê Mîn Dî Dilê Mîn Da Ye - K. Erlandsson-Svevar.....	22
Disiplin - Anton Makarenko.....	25
Quncikê Zarokan.....	28
Stranên Gelêri - Berevkar: Sipan.....	31

**Bergê pêşin:** Lî Mehabadê mîtingek (1979)  
Dr. A. Qasimlo qise dike.

**Sal: 10**  
**Hejmar: 68, Îlon 1989**

ISSN 0283-5355

**XWEDÎ : KOMKAR**-Swêd  
**BERPIRSIYAR** : Şeroyê BOTAN  
**NAVNIŞAN** : Döbelnsgatan 16 B  
113 58 Stockholm  
**TELEFON** : 08/ 32 82 51  
**HESAP NO** : PG. 458980 - 0

**UTGIVARE** : Svensk Kurdiska  
Arbetsföreningen  
**ANSVARIG UTGIVARE** : Ş.BOTAN  
**ADRESS** : Döbelnsgatan 16 B  
113 58 Stockholm  
**TELEFON** : 08/ 32 82 51  
**PG** : 458980 - 0

# Dr. İsmail Beşikçi Beraat Kır

Alım û niviskarê hêja İsmail BEŞİKÇİ, jî dewa xwe ya dawiyê beraat kır. Çawa tê zanin jî Beşikçi ra ceza di hate xwestin jî ber ku wi çend raman û pêşniyazên xwe li kovara "Özgür Gelecek" kiribû.

Dr. İsmail Beşikçi, par di hejmara pêşin ya ÖZ-GE (1988) da ev ditnên han anibû ziman:

*"Dwê Özgür Gelecek bona peydakirina mecala fikrandinê alikariyê bike.*

*Gerek insanê Kurd, bikaribe statuya cwata Kurd li Tirkîyê, li Rojhulata Navin, li Dinyayê bî ya gelên din ra rûberî hev bike... Mesela bikaribe pêwendiyên cwata Kurd, bî cwata Erebb, cwata Faris û cwata Tirk ra, jî aliyê abori, cwaki, siyasi, çandi û eskerî va raçav bike. Bî awakî serrû be jî dwê bikaribe van muqeyesan bike... Gerek insanê Kurd bikaribe li ser parçebûyîn û parvebûyîna welatê xwe bifikire.*

*Dwê Özgür Gelecek alikariyê bike ku, -li ba Kurdan zanina diroki û zanina cwakî pêşkeve."*



Demokrateki militan: İsmail Beşikçi

## XWEPARASTINA İSMAİL BEŞİKÇİ YA YEKEMİN (I)

Jî Serkariya Dadgeha Emniyetê ya Dewletê ra

Ankara

Esas No: 1984/19

Danêrên Berêz

Ez jî ber şirovekirîneke xwe ku li ser naveroka kovara Özgür Gelecek hejmara yekemin ya ku di Çiriya Paşin 1988'an da hatiye weşandin, tîm mehkemekirin. Dî wê pêvajoyê da, derbarî iddianameyê da, ez berjewendi (kêrhati, hewce) dibinim ku du babetên girîng şirovebikim. Ya pêşin babetêke huqûqî ye, ya duwemin jî li ser averûya (kavram) "metodê zanistê" ye.

Wek babetêke huqûqî ez dixwazim van tiştan ifade bikim. İddianame, dibêje "Her kesê ku li ser erdê Tirkîyê diji, xwediyê eynî identiteta (kimlik) netewî ye." û dixwaze bî xurtî bide kîşê ku, her ki li Tirkîyê diji Tirk e û pêra identiteta millî a Tirkî heye. Li vîra, min ku peyva "tabiyet" û "milliyet" herdu yek tişt in. Lê belê, "tabiyet" ew averû ye, ya ku di der-

barî huqûqa hevvelatîyê da tê bikaranîn, û "milliyet" jî averûyêke cwakî û siyasi ye. Dî iddianame da, herweha tê kîşkirin ku iddiakirîna hebûna komên din yên ku xwediyê identiteteke millî ya cuda ne, wê sûc teşkil bike.

Rastiyên herbiçav û ramanên zanistî, wê ditnê rast qebûl nake. Ev herweha jî bo Kurdan jî derbas dibe. Jî ber wê yekê, ez ne bî tesbîr û fikra iddianameyê ra me. Lê tiştê ku ez dixwazim li vir binim zîman, ne ev yekê ye, lê dixwazim jî wê nuqtê hereket bikim û derbarî naveroka mantiqa huqûqê û felsefa huqûqê çend gotinan bêjim.

Jî dawîya salên 1960'i pêda, ez jî ber pirtûk û nivisên xwe gelek caran hatim mehkemekirin. İddianame, beşekî jî vana dîde kîşê. Lê çendên din jî hene ku nehatine kîşkirin. Dî dawîya gîşkan da, ceza li min hatiye birin. Jî dawîya salên 1960'i şûnda, min hertîm ev tişt raçav kirîye: Ditnên ku bî kurtî dî iddianameyê da dihatin pêşkêşkirin, herweha ditnên mehkemê bî xwe jî bûn. Mehkeman, di bîyarên xwe yên sedemdar da, dîr û dirêj dinivisîn ku herkes Tirk e, eslê Kurda Tirk in, bî navê Kurdi zîmanek tune û hwd. Li aliyekî din, eva-

na tenê ditinên mehkeman ji ninin. Hakim û sawciyan ji yek bi yek ev ditin diparastin. Gelek caran, hin endamên heyeta mehkemê, di rojnameyên rojin da, di kovarên hefteyi yan ji mehi da, di nivisên xwe da her ew fikir û ew ditin ifade kirine. Aha babeta ku ez dixwazim li ser bisekinim, di vê nuqtê da ye. Di dawiyê da ev encam derdikeve meydanê:

Ez, ji aliyê hakim û sawciyên ku min û kesên mina min mehkeme dikin, tîm mehkemekirin, ji ber ku, ez wek wan nafikirim û li fikir û ditinên wan rexne digirim. Ew di nivisên xwe da dibêjin ku her kesê ku li Tirkîyê diji Tirk e. Em dibêjin, ev ditin şaş e, ne li gor rastiyên konkret yên civaki û ne li gor fikra zanisti ye. Em, behsa halê Kurdan dikin. Çima ku em ne bi wê fikrê ra ne û lê rexne dikin, em tîm mehkemekirin û cezakirin. Meriv dikare bi kurti bêje ku rewşa kesên ku qala pîrsa Kurdi dikin û pêwendiyên wan kesan bi mehkemê ra weha ye. Çimki ideolojiya resmi ya derheq Kurdan da ne tenê di biryarên mehkeman da tîm ifadekirin. Yek bi yek fikrên hakim û sawciyan ji di vê tûşê da ye. Û wek merivên huqûqê, ew, van fikran gelek caran di rojname û kovaran da ji tinin ziman.

Ev tişt, bêşik, bi navê huqûqê xetereke mezin e. Çimki mehkeme, ji bo dewletê haletên zordariyê yên herî girîng in ku dikarin ceza bidin kesan. Û di gelek pîrsan da, mesela di pîrsa Kurdi da, dema kesek wek wan nefikire, ev halet, ji bo cezakirina wan tê xebitandin. Diyar e ku, ev yek ji bo huqûqê birinên kûr vedike. Hemû ev tiştên han nişan didin ku, doz ne dozeke huqûqî ye, belê dozeke siyasi ye.

Dibe ku meriv bi hin kesan ra, bi sazgehane (muessese) ra eyni tiştî nefikire. Mesela dibe ku em mina rojnamevanan, yan ji mina hunermendan nefikirin. Lê di rewşeke weha da, newekheviya fikran, bi xwe ra sedemê cezakirinê nayne rojevê. Lê bi danêran ra meriv eyni tiştan nefikire, hingê cezayê girtinê bi xwe ra tine rojevê. Çaxa mehkemekirin li ser pîrsa Kurdan be, ev herdem weha dibe.

Tirkîye, di pêvajoyeke wisa da ye ku, guhartinên civaki û siyasi gelekî diqewimin. Sazgehên huqûqî, divê heta ji wan tê ji bo peyda kirina şertên pêwîst alikariyê bike ku, ev guhartin bê êş û jan, û bêlîvin pêk bên. Bona vê ji di wextê mehkemekirinê da, ne rastiyên ideolojik,

lê divê rastiyên berbiçav yên civaki û zanisti li ber çavan bên girtin. Berjewendiyên welat, yên wedê dîr û dirêj, di vê tûşê da ye. İddia ku dibêje "Li Tirkîyê tenê Tirkên bi şexsiyeta milli ya Tirk dijin hene, û sîc e eger hin kes bêjin ku bili Tirkan mîleteki cuda heye." kanalên guhartina civaki û siyasi dixitîmine. Û evana de wexteki dirêj da, ne li gor kara welat in.

Li ser metodên zanistê (ilmê) ji ez dixwazim van tiştan bêjim. Li Tirkîyê, di zanîngehan da beş û kursiyên wek arkeoloji, sosyal antropoloji, etnoloji hene. Di van beşan da, li ser kulturên kevn, qewmên kevn - çî yên li Anadolîyê, çî ji li derên dinyayê yên din jiyane, lêkolînên çekirin. Mesela li ser çand û bajarvaniya Etiyan, Frigyan lêkolîna çê dikin. Kasik û kûpikên bin erdê tîm ditin û di raxistinan da tîm nişandan. Etiyan xwarin û erzaqên xwe weha parastine, tê gotin. Tablet û nivîstên qewmên kevn, tîm ditin û nivisên li ser wan tîm raçavkirin û tehqîqkirin. Li ser kulturên Afrikayê, Rohilata Dîr û Indîyanên Amerîkayê, lêkolînên çekirin. Bi vi awayî hewl didin ku kulturên kevn, bajarvaniyên kevn derxan ronahiyê. Hewl didin ku ew di dewra nuha da ji bîr xwedîkirin.

Lê, li universitên Tirkîyê, cihê ku hemû ev pêvajoyên han pêk tîm hene. Li ser zîmanê Kurdi, çanda Kurdi, bajarvaniya Kurdi tu xebatek nayê kirin. Çimki dewletê qedexe daniye ser vê pîrsê. Sazgehên dewletê yên cure-cure, hurgilî tehqîq dikin, ka li van qedexan riayet tê kirin yan na. Xên ji vê, ji bo tunekirin û jîbirkirina zîman û çanda Kurdi hemû tedbir tîm girtin. Lê belê, zîmanê Kurdi zîmaneki jiyane ye, çanda Kurdi çandeke jiyane ye, diji. Li aliyekî, pêkanîna lêkolînên li ser çand û zîmanên qewmên 1000 sal berê, li aliyê din qedexekirin, tunekirina çand û zîmaneki jiyane, hevrikiyê (konflikt) kûr e. Neditîna vê rastiyê, vê hevrikiyê ne mumkun e.

Qedexekirina lêkolînên derheq Kurdan da û riayetkirina universitên Tirkîyê li van qedexeyan, û beşdarbûna wan di wê propagandayê da, ya ku dibêje eslê Kurdan Tirk in, evana hemû bi bandora ideolojiya resmi va girêdayî ne. Lê belê, çî qedexekirina lêkolînên hin pîrsan, çî ji riayetkirina li van qedexan, jiyana fikir û zanistiyê a li Tirkîyê gelekî kûr birindar dike, kor û seqet dike. Ev pêvajoyê, di wede-

ki dûr da zîyanê dîghîne îtibara welat. Lî vîr pêwîst e ku ev rewşa han bî metoda îlmî va girêdayî bête diyarkîrîn. Îlm, kîngê lî îdeolojiyan, dî vê navberê da, lî îdeolojiya resmî rexne bigre, dîkare bî pêşkeve, îtibarê peyda bike. Bî îtibarkîrîna van qedexeyên ku îdeolojiya resmî daniye, pêşketîna fikir û îlmê ne mumkun e. Jî ber vê yekê, nakokiyeke kûr e, weki universita Turkiyê lî aliyekî çand û bajarvaniyên pîr kevn vedijene û derdixê ronahiyê, lî aliyê dîn naxwaze zîman û çandeke ku îro heye û dîjî, bîbine û serda jî çavê xwe lî qedexekîrîn û tunekîrîna wê digre.

Danêrên Berêz,

Dî navbera îlm û îdeolojiyê da nakoki, hevrikiyeke kûr heye. Îlm jî rastiyên berbiçav dikeve rê. Zanînen ku jî aliyê îlmê va tînen efrandî, bêşik dîkarîn bî rexnekîrîn, pûçkîrîn. Pêvajoya zanîstî dinamik e, tewbar (esnek) e. Lê îdeoloji bî xwe, dî dereca yekemîna da, xwe dispêrîna bir û bawerîyan. Hîna dîtinên pejîrandî hene, ku hertîm tînen parastîna. Îdeoloji ew sistemên hîşkîna, yêna ku lî ser wana gotîbêjî nayê kîrîn, û nayên rexnekîrîn. Îdeolojiya resmî jî ew e ku, bawerîyek, jî aliyê dewletê va, bî saya mûeyyîdeyên cezai lî piya tînen sekinandîna, û tînen hewlîdayîna ku ew jî aliyê mirovan, sazgehîna û gel va bînen pejîrandîna.

Madem dînya dîzîvîre û ev yek bî delîl-

an tînen îsbatkîrîn, hîngê dîvê îlm, her dem vê rastiyê bîparêze. Dîbe ku, îdeolojiyeke resmî jî hebe ku gotîna vê rastiyê qedexe bike. "Dama mirov bêje dînya dîzîvîre, ev nehîzkîrîna welat û gel e, jî gel û welat ra îxanet e," dîbe ku îdeolojiyeke resmî jî hebe ku van gotînan bêje. Dî nav van hoy û şertan da jî, dîvê îlm, rastiyê ango zîvîrîna dînyayê vekîrî bêje. Bo zemanê dîr, berjewendiyên welat, dî vê meylê da ye. Kes, dîvê bêtîrs û bêî ku mûeyyîdeyên cezai derkevîna pêş wan, bîkarîbîna dîtinên xwe bêjîna. Medenîyet ev e.

Iddîname, aşkere dîbêje ku, suc e jî bo Kurdîna, ku ew îdentîteta xwe ya netewî îfade bîkîna. Em pê dîzanîna ku, hemû sazgehên huqûqî yêna Turkiyê, dîxwazîna ku her cure tedbîr bînen standîna, bo kuTurkên Bulgarîstanê, yan jî yêna roava Trakyayê bîkarîbîna îdentîteta xwe ya netewî bîparêzîna. û em jî nêzik va dîzanîna, ku ew sazgehên huqûqî, bona vê yekê daxwaz û pêşniyazên xwe lî partiyên siyasi, hukûmetê û sazgehên wek wan dîkîna. Loma dîvê ev fikir "Dîvê Kurd bîkarîbîna îdentîteta xwe bîpîrsîna," nebe sedemê cezakîrîne.

Danerên berêz,

Lî dîjî iddanameyê gotînen mîna bî kurtî evana ne. Bî rêz pêşkêş dîkîm. 23 Adar 1989

**İsmail Beşikçi**


## XWEDI Û BERPIRSIYARÊN KOVARA ÖZGÜR GELECEK HATIN GIRTIN

Xwedî û berpîrsiyarê weşanê, Mehmet Bayrak, redaktorê berpîrsiyar Bekir Kesen û Çelal Gül hatin girtin.

Çawa tînen zanîna kovara ÖZ-GE, kovareke mehilî ye û jî meha duwanzda sala 1988'an heta niha, jî ber zordestîya polîzê dewleta Tirk tenê 8 hejmar derketîna. Polîz hîna dî çapxanê da dest dani ser çend hejmarên wê. Hejmara dawiyê jî dî çapxanê da hat girtin.

Berpîrsiyarên wê dî bîna zulm û êşkencê da ne, jî ber ku behsa pîrsa Kurdî dîkîna, lî dîjî kîrîyarên hukûmeta Tirk derdîkevîna. Zordestî û terora lî er pressê, bî taybetî lî ser weşanên ku behsa pîrsa Kurdî dîkîna girantîr û dijwartîr e.

Lê qedexekîrîna çapgeriyê, şewîrandîna pirtûkan, girtîna û êşkencekîrîna çapgerîna jî bo dewleta kolonyalist xîlazî nîne. Ew bî vê zulmê û zordestiyê nagihîjîna armanca xwe. Tenê rîk û netewî gelê me yê azadîxwaz mezintîr dîkîna.




## EBDULLAH PEŞÊW

**E**bdullah Peşêw, di sala 1945-'an da li Kurdistana Başûr, li gundeki Hewlêrê (Erbil) hatiye dinyayê. Hina di salên biçûk da bavê xwe winda kir. Wi di nav hoyên gelekî dijwar da xwendina xwe kuta kir. Piştî ku li welat çend salan mamosteti kir, ji bo ku xwendina xwe dom bike çû Yekitiya Sovyet. Ebdullah Peşêw li wira, li ser edebiyata Kurdi xebata xwe pêşda bir û di sala 1986'an da çû Libyayê ji bo ku li zaningeheki (Universite) ders bide.

Ebdullah Peşêwê cıwan, hina di 14 saliya xwe da dest bi nivîsandina helbestan kir. Heta iro gelek diwanên wi hatine çapkirin. Herweha gelek helbestên Peşêw di rojname û kovarên Kurdi da hatine weşandin.

Berhemên Peşêw:

1. Bitişka, 1968
2. Firmêsk û Zam, 1967
3. Şewnamey Şairêki Tênu, 1972
4. Duwanzde Wana Bo Minalan, 1979 (Berlin)
5. Şew Niye Xewtan Pêwe Nebinim, 1980



Ebdullah Peşêw

6. Sedem Sal e. (Yek helbest), 1981

Bili helbest nivîsandinê, wi ji Pûşkin û gelek şairên biyani helbest wergerandine Kurdi. Li vir em çend helbestên Eb-

dullah Peşew pêşkêşî xwendevan-  
nan dîkîn.

### SERBAZÎ WIN

Ke wefdê deçête şwênê  
Bo ser gori serbazi win  
Tace gulineyek dênê  
Eger sibey  
Wefdêk bête wîlati min.  
Lêm bîpirse:  
"Kuwanê gori serbazi win?"  
Dalêm:  
-Gewrem!  
Le kenari her cogeyê,  
Le ser sekoy her muzgewtê,  
Le ber dergay  
Her malê,  
Her kilêseyê,  
Her eşkewtê,  
Le ser zînari her şaxê,  
Ler ser direxti her baxê,  
Le Kurdistan  
Le ser her bîste zeminê,  
Le jêr her geze asmanê,  
Metirse!  
Kemêk serdaxe û  
Tace gulineket danê!  
1979

### TEHRÎB

Le asmanawa ne hatûm  
Min miwan nim  
Min miwani  
Sêber-qursi Kurdustan nîm  
Ber le mêjû  
Kaniyek bûm lêre derbûm  
Ber le mêjû  
Agirek bûm lêre hel bûm

Barken biron!  
Kanyawekan cige le min  
Kesêki tir têraw nakin  
Darcuwêzekan cige le min  
Bo hiç kesek  
Sêberi xoyan helnaxen

Barken biron!  
Zewî ême  
Dani êwey lê şîr nabe  
Mêrgî ême  
Le jêr pêy garanekantan wek  
agırin  
Ta dartûşman yaxî debîn  
Colaneyek bo mînaltan ra  
nagrîn

Barken biron!  
Mîwey dirextekanman kale  
Awman şwêre  
Hengwinman bedemtan tale  
Barken bron!  
Barken bron!  
1970

### AŞTÎ

Xwa dezani  
Balay tiwengûm xoş navê  
Balam, ax, kotirekey aşti  
Kirre, wekû  
Şerrebefriney beyani  
Le ser lûleyi  
Metrelozi westa "Receb"  
Denûki xoy  
Xîstote jêr balekani  
Wek bistûme  
Ew kotire mangirtûwe  
Le asmani wîlateki bê alada  
Be şrixey tiweng nebê  
Qet le şeqey bali nade!  
1973

### SERKEWTIN

Serdekewin  
Çûnke diwênê,  
Tope qureki deskirdim  
Daye dest mînaleki Kurd  
Ew lebatî bûkêşûşe  
Tiwengêki biçolaney lê drûst  
kurd.  
1973

# TEMAŞEGEHA WÊNEKARÊN KURD

Çendeki pêşda di Mala Wênekarên Gurcistanê da, temaşegeha 17 wênekarên Kurd ji gel ra hat pêşkêşkirin. Ev bûyera çandi, di diroka Kurdên Yekitiya Sovyetê da cara yekemin e pêktê. Xebatkarên hunera bedewiyê, ji bajarê Erivanê, Tibilisê, Moskovayê û ji Kurdistanê tevi vê pêşangehê bûn.



Didemek ji temaşegêhê

Ji bajarê Erivanê sê kes in: Keleşê Qadir, Mamoê Kogo û Cemalê Jora.

**Keleşê Qadir** ji sala 1983'an virda li fakülteta nexşnemûriyê a institûta Erivanê ya pedagojiyê dixwine. Ew bi van xebatên xwe, di pêşangehê da beşdar bûye: "Keçika laçiksor", "Wênê (resmê) keçikê", "Kurdistan" "Qe-dera xirab", "Xanê" û çend efrandinên grafikayê li ser jiyana gundê xwe, li ser aşîtiyê, li ser zarotiya xwe û yd.

**Cemalê Jora** di sala 1987'an da in-

stitûta jorgoti (ya ku li jorê hatiye gotin) temam kir. Xebatên wi: "Wênê edibê Kurd Tosinê Reşid", "Xort", û "Keça Kurd", geleki hewaskar in.

**Mamoê Kogo** tevi hevalê xwe Keleşê Qadir dixwine. Xebatên wi yê bi navên "Sipan" Xwepotre", "Rê", û "Gundê Kurda li çiyê" jêhatiya wi di dîn kîvşê.

Ji 14 wênekarên Tibilisê pênc kesan Akademiya Tibilisê ya Wênekarîyê a Dewletê kuta kirine:

1. **Antonê Otar.** Di sala 1980 da ji temaşegeheke wêneyên wi çê bûbû. Efrandinên wi "Şayiya Kurda li



"Keça Kurd" ya Mirazê Osman




"Ber Kaniyê" ya Miranê Oko





"Reqasa Kurdi" ya Androyê keleş



Xebateke Rexber Geleş

gund", " Nanpêj", "Reqasa Kurdi- Hoy Narê", "Nanê germ", "Keçika Kurd" û yên din beşera mirovan xweş dîkin.

2. **Besa Payele.** Dest û tiliyên wê yên bî huner, xaliçên pircure dihûnin. Sitya Besê, pêşeyê netewî ê kevn berdewam dîke. ( Keçên Kurd, xaliçe û emenî çêdikirin ku ji wan ra dibûn cihêz.)

3. **Mirazê Osman** bî van efrandinên xwe va temaşegêh xemiland: "Def û zurnevan", "Deweta Kurda lî Tîblîsê", "Wênê keça Kurd" û yd.


4. **Androyê Keleş,** di wêneyê "Reqasa Kurdi" da bedewiya xortê Kurd bî agir di çavan da nişan dide. Lê wêneyê lî ser jenosida gelê meyi bêxwayî bî destê rejîma Iraqê a faşîst janê dixê dilê mirovan.

5. **Lyovayê Cindî,** bî iskûstva abstrak va mijûl dibe, û ew kompozîyonên wî yên ku tiyatroya Tîblîsê a Kurdi dixemilînin, dinya ditîna wî ya fire nişan didin.

Di efrandinên **Rexber Geleşê** jî Kurdistanê, yê ku lî Moskovayê di Înstîtûta Hunerê a V.Î. Sûrikov da dixwîne, rewşa pêşmerga a roja iroyin a dijwar nişan dide.

**Têmurê Efo, Samvêlê Pare, Têngîzê Sadoyan û Têmurê Keleş,** xebatên xwe bî şûşê rengin, hesin û metalên din neqîşandine.

**Garikê Efo** bî şiklê "Kurd", "Reva Kurdan", "Kalê", "Xweportre", "Baxçê



Xebateke (Xaliçe) ya Besa Peyale

Tîblîsê" û yd. dilê merwa şa dîke.

**Miranê Oko-** meriveki pîr mîl-lethîz, efrandinên wî tev lî ser Kurdan nîn. Biranînên xwe yên zarotiyê di wêneyên xwe da nişan dide.

Şiklê **Gulixanê Mamed** "Hewara Dayikê" lî ser tirajediya Ermenistanê ye. "Wênê Xwendekarê Kurd" û yd. bî rengan va geleki hewaskar in.

**Bayloz Kakanov-** xorteki bî feraset, di efrandinên xwe da jîyan û pêşeyê Kurda propaganda dîke.

Dawiyê, em bî saya kovarê, desanînen van hunermendên me pîroz dîkin û ji wan ra pêşketînen nû daxwaz dîkin.

Marina Eziz

## B1 Ser Xanê Bedlisê ra Sefer

Werger: DILSOZ

J1 bo banga komela Wanê ne Xanê Bedlisê Evdal Xan hat ne ji hewara wi. Paşa, ji bo vê yekê gelek li ber xwe ket û tevi Ahmed Axayê Erganiyê ji Xan ra nameyên dostaniyê nivisi. Gava name gihştin destê Xan, Xan wana xwend û weha bersiv da: "Hespê me ji Wanê av venaxu" û di mana "ji mezinahiyê ra rê tune" awirek da merivê serê (qasîdê Melek Ahmet Paşa). Ev axayê han ji (Ahmed Axayê Erganiyê), ji Bedlisê b1 ser deryaya Wanê ra, di du roj û du şevan da destvala ziviri. Gava Ahmed Axa bê name hat û behsa rewşê kir. Paşa bû heste û pûşi, bû sotikeke agir û jê ra tebat nema, derdê wi girantr bû.

"B1 fermana Xwedê" ew roj b1 gerê (b1 peyati), li kela hundir a Wanê çû ziyafeta Abdi Axayê yeniçeriyân. B1 hemû axayên Wanê ra axîfî; hemû giregir, hemû malmezînen Wanê û hemû mirên

Kurdîstanê derheqa Xanê b1 şan û şeref (Evdal Xan) da gili û gazînen xwe anin zîman:

- Bê imaneki wisa ye ku, gerek ji holê bête rakirin; elewi, b1 fen, zordest, qeder-mezheb, gu-nehkar, afcîr, lûti, sêrbaz, remildar, sextekar û der-ewkareki mezin e, ku ji çil salan virda kuştina wi şert bûye. Her weha ev qewmê zalim, di derheqa Xanê ku ji van tîştan bêhay bû wisa galegal kirin, ku ji sinorê fesadiyê yê xerabtirin ji derbas bûn. Lê b1 hikmeta Xwedê, tîştê ku wê biqewime diqewime. D1 vê civina mezin da hêj di derheqa Xan da dişewirin, serdegevan kete hundir û weha got:

- Sultanê min, ji ba kurê te yê Waliyê Erzurumê Tavûkçû Mustafa Paşa, qasîd (elçî) hatine. Ji yeniçeriyên Wanê ji, çend yeniçeriyên birindar hatine, got. Paşa: "Bila zû werin" got. Qasîd hate

hündir, erdê maçkır û nameya Waliyê Erzuromê da destê Paşa. Paşa ev nameya han xwend. Gotnên namê weha bûn: "Efendiyê mın, ji bo xatirê Xwedê bî navê Xanê Bedlisê, eşqiyayê ku dî sinorê te da ye, bî deh hezar peyayî bî şevê avêt ser welatê Mihemed Begê Melazgirê, ku dî eyaleta mın da ye, cihê sancaxeki me talan kîr; bî qasî sêsed musulmani kuşt û bî jamare çil hezar mihên Qerqas da pêşiya xwe û bîr. Efendiyê mın, dî eyaleta te da ye, helbet tê ji heqê wi derêyi. Eger ev işê hanê çareser nebe wê wilayeta mın, talanbûyi, meriv û pısmamê şehidan tevi gomlekên bî xwin herin devê derê dewletê, paşê wê ji sultanê mın ra sergêjayî çêbibe. Eger bî fermana te be, bî ser wi rape-rinvan û rêbirê va seferek bîkîm. Ez lî benda nivîşareteki efendiyê xwe yê mezîm im, ku ez û bîst hezar eskerên mın werin wê derê û lî pêşberî te hurmeta xwe nişan bîdîm.

Gava dijminên Xan vê nameyê bîhistin, wek Zuhre (stranbêjeka navdar a wê demê) reqîsîn. Hingê alayeke yenîçeriyên Wan û Erzuromê hatin pêşberî Paşa.

Yek jî wan, milê xwe yê hilqetandi avêt pêşberî Paşa:

- Medet ey wezîr, heqê mın heq bike, got û hawar û zarîn pê ket, Paşa got ku:

- Geli gazîyan, çî bûye bî we?

Birindaran:

- Sultanê me, me berê xwe daye van Serhedan û bî ticaretê rîzqê xwe derdixîm. Dema ku em bî dilê xwe ketin bajarê Bedlisê, bî ûcba ku "jî hemû baran bac stendî qanûn e" me vê derê teslim girt û bî riya qanûn bac stend û ev dî mehkemê da hate qeydkirin. Lê eger gotin dî cih da be, dema ku (Evdal Xan) avêt ser wilayeta Mihemed Begê Melazgirê, gelek malên me jî me stend û da Kurdan û wan kîr esker. Gava ku em jî derketin pêşberî wi, me da kutan û bî vê hawê birindar kîr. Heqê ummeta Muhemed e ku, em lî Serhedê wek dergevan jî bo dîn şer bîkîm û serda jî heqaretê bîbinin, Xwedê viya qebûl dîke? gotin û hawar kîrîm.

Paşayê dûrditi, "zû, bîla mela û muftiyê çar mezheban werin!" got û ferman da ku mela û muftiyê çar mezheban lî pêşberî Paşa, lî gor zîrara dawekaran giliyên wan guhdari bîkîm. Pîştî careke dîn, "bûye rêbir (qesta wi Evdal Xan e) û tevi ku ne hedê wi be avêtiye ser wilayeta Erzuromê û bî sedan insan kuştîye" got û bî şêxên islamê fitwa da nivîsandîm. Melayê Wanê jî, lî gor fitwayê belgeya şîretê nivîsî û da destê Paşa:

- Xeza (şerê jî bo dîn) we pîroz be! Hema niha jî du aliyan va şûrê xîretê bîdîm pîştî xwe û gewda wi eşqiyayî jî rûpela dîne derîm, got û duayan

kîr. Dijminên Xan kêfxweş bû û çûn.

Lê Paşa tedbir stend:

- Divê em, ewil bî şeweyek dostaniyê jê ra nameyek binivîsin û wi dawetê şerîetê bîkîm. U lî gor qanûnên Suleyman (Qanûnî Sultan Suleyman) bîla were komela Wanê û bî Mihemed Begê Melazgirê, dawekaran û birindarê yenîçeriyân ra mehkeme bibe. Eger jî şerîetê bireve, bî fermana Xwedê wê bîyara seferê muheqeq bî cih bê, got. Mec-lîsa ku hazîr lî wê derê bû:

- Medet ya sultanê me! Niha Xan dîzane, ku ew sûcdar û berpirîyar e. Bîbê nebê wê eskerên xwe lî hev bîcîvine û lî ciheki welatê me xe. Şîkîr jî Xwedê ra, bî qasî derya eskerê me jî bo ajotna erdê Timûr hêj lî wê derê amade ye. Bîla jî vê saetê pêva, bî niyeta şer tûx (termeke eskerî) herin Çaybaşî, gotin û zor dan Paşa, teklîfa mal lî kîrîm.

Paşayê bî edalet, jî vê halê ra nerazibûna xwe nişan da û "bîla name bête nivîsandîm!" got, mec-lîsê belav kîr.

Lî kela hundîr a Wanê Paşa, hanhanka nanê axayê yenîçeriyân xwar; tevi hemû esker, serbaz (sûbay) û ulemayan derbasi konê jêrin bû û jî mîn ra: "Zû bîla jî Xanê Bedlisê ra name bête nivîsandîm!" got û lî ser sekîni. Nameyeke ne sererast hate nivîsandîm.

Name hate nivîsandîm. Pêra gîlînama Waliyê Erzuromê Tavûkçû Mustafa Paşa jî hate nivîsandîm û ev nameyên han bî serdegevanê Paşayê me ra, bî ser Kûskûnkîranê hatin şandin.

Name, dilê Xan bî xwin dîke û Xan weha dibêje:

- Wey lî mîn, me çî sûceki ecêb kîriye ku kuştîna me şert bûye û welatê me, wilayeta me jî talan û wêrankîrinê ra, biçûkîstîm û xerakîrinê ra layîq hatiye ditîn! Fermanê Xwedê ye, du dest jî bo serîki ye, got lî ba axayê namebîr halê xewa kewroşkê nişan da. Bî fîkîr û ramana ku -belkî Melek Ahmed Paşa, pîştî vê nameyê bî dîzi û bî şevê bîgre ser bajarê me û talan bike- bî lez jî begê Kurdan ra name dînivîse û esker dîxwaze.

Jî alîki va jî, mezêlê Şeref Xan vedîke û jî der û dor hîvde hezar çekdar lî dora xwe dîcîvine, çaralîyê bajêr bî kemîn û Îskenderiyên qewî tekûz dîke. Her weha bî şev û roj, deh hezar (10.000) zîlam çavnêriya der û dor û bajêr dîkîm. Bî kurtî jî cihê xwe yê bîst û şeş (26) qazîyan û jî hemû begên Kurd ên dost hîvde hezar peyayên çekdar; jî eşîrên dorhêlê jî, deh hezar sıwar cîvan û xwe jî şer ra amade kîr.

(Gername, cild 4, rûp: 190 - 196)

Xanê Bedlisê, nameya ku nıvisibû bı axaki (keya, yawer) û gelek giregirên Bedlisê ra şand ba Paşa. Ev nameya dılxweşkirinê lı Kela Wanê gıhişt destê Paşa. Mihemed Begê Melazgirê ji bo nedana heqê mihên zozan digre ser Xan û şer dike. Mihemed Beg sûcdarê hêman (esas) e, huzûra wi (Evdal Xan) revandiyê û ji ber ku yeniçeriyân êrişî Xan kiriye, Xan ji heqê wan derketiyê û w.d. gılınameyên wan tên û Canpolat Axayê ku nameya Paşa bırıbû, tevi nameyan hat. Lı pêşberî diwana Wanê nameyên Xan hatın xwendin. Paşa ji vê nameyê acız bû û:

- Lê çıma ew bı xwe nehat cemiyeta Wanê û şer'a resûlê sultan? got. Axayê Xan got ku:

- Sultanê mın, piçek ne rehet e. Jı sultanê mın tıka ew e ku, tu wi û yeniçeriyân lı hev bini. Her weha mın bê qımetî kiriye wekil û şandıye meqamê te. Gava wekilê Xan vana got, heyeta giregirên Wanê:

Wezirê ezim, fen (hile) lı sultanê me dıgerine (qesda wan Xan e). Hêj ji pênc, deh hezar esker qeyd dike. Em ê rojek bıbinın ku ji mışkava welatê me wek wilayeta Mihemed Begê Melazgirê xerabe û wêran, xaniyên me kambax kiriye û wek kalê xwe yê Şeref Xan reviyaye çüye welatê Ecem. Lewra vana ji berê va dijimê ocaxa me ne. Hêj ku ewqas eskerên islamê lı komela Wanê amade ne, divê em bıgrın ser wi û ji heqê wi derên, gotın û bı vi awayi bı heftê hezar fen û şeytani pêli damara Paşa kırıın û bıxwazın nexwazın, bıryar dan ku bıgrın ser Xan. Şeş hezar eskerên bıjare yên Mehmûdi (navê eşireke Kurd e) û ji bınya Wanê konê Paşa yê nehemin, lı gundê Çaybaşı hate bı cih kırıın. Paşa, lı bınya Wanê guh da haziriya seferê. Dı nav bajêr da telalan bang dıkır û hemû ji bo şer xwe amade dıkırıın. Heftê serdergevan, tevi fermanên piroz çün ba begê sih sancaxên eyaleta Wanê û eskeran; bı fermanên piroz axa çün heftê qezayan û disa Paşa, tûxraya (alaya eskeri) çırı-sandı dıkşine û tevi du hêzên eskeri û axayên xwe, Ahmed Axayê Erganiyê dışine ba Waliyê Erzuromê Tavukçu Mustafa Paşa û ji eyaleta Erzuromê Xıms Beg, Tekman Beg, Kûzûcan Beg û Avnik Beg dıxwaze. Axaki dıçe ji Waliyê Diyarbekır Firari Mustafa Paşa ra bı xwe tûxra dıkşine û jê dıxwaze ku, Meyafarqın Beg, Tercil Beg, Ataq Beg, Qulp Beg, Mihraniye Beg, Pertek Beg û Saxman Beg -ku lı ser eyaleta Diyarbekır Bûn- tevi eskerên xwe yên bıjare, ji paşva dor ji Xan bıstının û bèn.

Bı kurti roj bı roj lı bınya Kela Wanê, ji bo ku bıgrın ser Xanê Bedlisê, wek derya esker cıviya. Paşayê bı tedbir, derhal ji ji Kela Wanê pênci to-

pên şahî, şeş topên balyemez û hemû lazmatiyên wan amade kır û bist û şeş keştiyên deryaya Wanê bı bê hed û hesab cebılxane, bı hezaran qenter pek-simet û barût da barkırıın. Be kêf û şahî azan xwend, xwe sıpart Xwedê û berbı rawesa (liman) Adilcewazê çün.

Paşayê ku tedbira her tıştı stendibû û fıkrıribû, axaki şand ba Begê Mûşê û bı fermaneke -ku ji çar rêzan pêk hatıbû- şeşsed cot gamêşên topkêş xwest.

Roja duşema yekê Remezanê (5'ê Tirmeha 1655'an), bı dua û sena ji Wanê rabûn û topa Süleyman Xan a bı navê Kesik da teqandın. Gulleyên hesını, ku her yek jê pênci qıyye (: 400 dirhem yan ji 1283 gram) bûn, bı ser eskerê islamê da gurini kır û me verêkır, ku hemû gaziyan xof girtın û hemû hespan tırsiyan. Jı wê derê berbı bakûr, dı çar saetan da gıhiştın Çaybaşı.

Bı fermana Xwedê alaya ku bı rê ket, hınek lı pêş rasti İbrahim Begê Mehmûdi û şeş hezar mêrxasên wi tê. İbrahim Beg û şeş hezar mêrxasên wi, wek Çarkacı tayin dıbin. Tûx zêde naçın pêş û dıkın ku bı Paşa ra herın. Mihemed Begê Melazgirê yê ku dijimê Xan bû, tevi sê hezar mêrxasên xwe gelek qereqolan (mıfırze, dewriye) pêk anin. Begê Tekmanê û Begê Xımsê ji milê rastê ra, Begê Mûşê û Begê Adilcewazê ji milê çepê ra tayin bûn. Begê Pinyaniş û şeşsed mêrxasên wi ji qereqola rastê ra hatın tayinkırıın. Begê Gaziqıran ji milê çepê ra tayin bû û qereqoleke zırav pêk ani. Her weha dı navbera qerexê deryaya Wanê û beriya Rehwayê da, lı mêrga Çalış hemû eskeran konê Paşa lı dû xwe hişt û bı rêzê lı çaraliyê vê derê qat bı qat çadır hatın vegirtın.

Bı vê hawê peyayên Xan, yên ku dı keminan da bûn, avêtın ser eskerên islamê û xebatkarên ku lı seransarê beriya Rehwayê ji bo gıhaçinê raweşiya bûn. Pıştı şereke dijwar, pênci mêrxasên me kırıın erdê (kuştın), serê kuştıyan û şeş mêrxasan dil girtın û bırin ba Xan. Xan wana (dilan, hêsiran) dıkşine ber ifadan: "Çıqas eskerên we hene? Begên ku ji Erzuromê hatine ki ne? Rewşa cebılxane û topan çawa ne?" û her weha pırsiyanan ji wan dike û serê merivê deh zêr dıde wan. Paşê serıyan (keleyê kuştıyan) lı paşıya hespê wan dıde girêdan û ji ordiyê ra (ordiya Melek Ahmet Paşa) dışine. Eskeran, serê şehidan pêça û lı ciheki veşart. Hemû gazi bûbûn wek sotikê ağır û ji bo bıındkırıına daxwaziya şer bangi hev dıkırıın.

Hingê Begên Erzuromê tayinê çêregehê bûbûn û eskerên xwe dı keminan da bı cih dıkırıın. Peyayên Xan, ji bo jêkırıın û bırina kelleyan (serıyan) hatıbûn wê derê. Gava van peyayan girtın ser

peyayên ku dîçûn gihaçminê, eskerê Begên Erzurumê ji keminan pekiyan û êrişî eskerên Xan kîrîn. Dî navbera wan da şereke dijwar çêbû. Dî vi şeri da esker, heftê kelle û bist Kurdên Yêzîdî dil girt, anin ber konê Paşa. Jî bo vê yekê jî Paşa qeftanan (cûreki palto), çelengan (tuşteke bî nexş, ku jî madden û mucewher çêdibe û meriv dide serê xwe) stendin. Paşa, dilan yek bî yek da xebêrdan. Bî navê Baxcioklû meriveki, ku pîrxeber bû, bê tîrs û bê şerm got ku:

- Sultanê min, welleh niha dî meydana şerê Xan da deh hezar çekdar û deh hezar sîwar hene. Pêncî hezar peyayên bî xencer, bî tir û kevan û xelkê çekdar çaraliyê bajarê Bedlisê pênc qat - şeş qat girtine û dî wû mîntîqa bî kevîr da kozîk û bendan çêdikî û diparêzin. Xan, axayê (keya) xwe yê ku navê wî Qere Eli ye tevi sê hezar çekdar danîye kelê da ku wê derê biparêzin.

"Xan bî xwe jî, tevi sê hezar eskerên dora xwe bax û baxçê xwe diparêze. Lê sultanê min, jî roja ku hûn bî xweşî hatin kela Adilcewazê vîrdî da bajarê me yê Bedlisê da jî ber zulma Xan, hemû xelk revîyan çol û çiyayan, jin û zarok tîn wer-girtin û mal tîn talankîrîn. Dî nav bajêr da waweylê û figanek heye ku, bî şev û roj wek meşer e."

Paşa jî xebêrdanê wî mervî kêfxweş bû û:

- Were nêz! Ka bêje! Jî began kî hatiye hawarê? pîrskîr.

Zîlamê rastbêj û zîrav got ku:

- Wellahi sultanê min, gava jî eyaleta Diyarbekîr Begên Çebaçqûr û Çemişgezekê tîn hawara Xan, Waliyê Diyarbekîr pê dihise û esker dîşîne pêşîya wan, "hûn çîma bê ferman alîkariya Xanê ku lî dij padişah serî hîldaye dikî?" dide pîrskîrîn û her weha herduyan dide girtin, dîşîne Diyarbekîr.

Lê sultanê min, jî eyaleta Diyarbekîr Begê Hezo Murteza Beg hêj jî, tevi eskerên xwe lî Bedlisê ye. Jî eyaleta Diyarbekîr Begê Cîcka û jî eyaleta we ya Wanê Begê Zerbakî hej jî lî ba Xan in. Disa jî eyaleta we ya Wanê hemû begên Sêrt, Karkar, Şoroy, Karnî, Hiron, Axakîr, Keşan, Meks, Berdaa, Ladîk, Ereçîk, Dalakîrer, Çobanlı, Hekarî, Beni Kotor, Abagay jî Xan ra alîkariya şandîne û ew bî xwe jî, jî bo alîkariya we lî ber hatîne ne. Lê nayên. Hêj jî, lî çiyayên pîşt we dî keminan da xwe veşartîne. Dîfîkîrîn "ka wê rewşa çawa dom bike" û dî keminan da çavneîriya we dikî. Xwedê nişan nede (Allahumme afena), eger Xan we jî hev belav bike ew ê jî çiyayan pîştê jî we bistînin û ehlê Wanê -yên ku bûne sedemê vê seferê- bîdî ber şûra. Ey wezîrê mezin. eger tu gotîna Baxcioklû guhdarî bîkî jî Xan metîrse, qewmê wî Rûjî

ye û hîm ne şervan in hîm jî jî Xan dîlşikestî ne. Lê haya te jî Begên Gurcîstanê, ku nehatî hawara te, hebe û xwe jî wan biparêze! Lewra dî navbera wan û Xan da peyman heye û jî Xan wek diyarî qumaşên çek û libas stendîne. Haya te jê hebe, tu nêyi xapandî ey wezîrê bêtîrs! Lê sultanê min, te bî xwe berya vê hingê jî Waliyê Diyarbekîr alîkariya xwestîye. Ew jî, tevi bist hezar esker lî ber hatîne ne. Gava hûn jî, bî heftê hezar esker hatîne vê hêlê tîrs û xof, guft û goyek kete nav bajarê Bedlisê û xelk, "em dî navbera du eskerên zalîm da man, wey lî halê me!" dibêje û nava Bedlisê hêj jî wek qiyametê ye, lê disa jî jî bo şer amade ne. Lewra jî alî Diyarbekîr va rêyên Kevîrê Qul û jî alî we va jî zînarên Dehdîvan û Evîç girtîne, deh qat kemin û bend danîne.

Jî ber ku ev dilê han rastiya rewşa herdu alîyan rasterast got Paşa, sed zêr dayê û wî azad kîr û pîstre tevi deh merivan şand ba Xan.

Gava Paşayê bî tedbir xwest nozde dilê dîm bide xebêrdan, hemûyan:

- Haya me qet jî Xan tune, gotîne û her weha tu agahdarî nedan. Paşa gelek hêrs bû û serê hemûyan (19 kes) lî pêşberî kon da jêkîrîn û wek topa Çevganê gêr kîr...

Gava Paşa, jî bo xebêrdanê dîçû ba Mihemed Beg ez jî dî kon da dîmam û bî xulamê mîftê, bî navê İkbâl meriveki û çend xortê yenîçerî yên bijare ra hîn tîştên dîm xebêr dîda. Jî ber ku ez bî rojî bûm, wextê min bî şîkandîna fîstîqê Şamê û beivan derbas dibû. Carekê min jî nişkava dî ku sîwarekî tevi hespê xwe yê sor û kîhêl, dî dest da rîma Kantar û mertala Çîni bendên kon bî şûr parçe kîr û bî ser min da ajot.

- Ka Paşa, dawîya Melek Ahmet Paşa hatiye, got.

Kurdeke wek zebanî!

Hema wê gavê min got:

- Tê bî Paşa çî bîkî?

Bî zarê xwe yê Kurdi:

- Ez ê vê rîmê dî zîkê Paşa da rakim, got.

Jî ber ku xulamê mîftê bî aqîl û fîkrê xwe Abaza bû:

- Werî em wî Kurdi bîkûjin û hespê wî jê bistînin, got.

Min feqîrê Xwedê: -Kuro hûn çî dîxwazî? got û nehişt û jî wî Kurdi ra jî:

- Hêy lolo vaye Paşa, got û konê Yusuf Kethuda nişan da.

Yawerê Paşa:

- Bendên vê konê bî şûr ev Kurdê han birî? pîrskîrîn û bî balte, kutek û xenceran wî mervî tevi hespê wî dan revandî.

Mêrik bawer kîr, ku Yusuf Kethuda Paşayê rasti ye û wek birqa ku çavê meriv jî berê leylan dîde ajot nava kon. Kethuda wisa ecebmayî ma ku, te dîgo qey rîmê Îpşîr Paşa ye. Feqîrê Yusuf Kethuda bî tîrs jî cihê xwe hîlpekiya.

Gava Yusuf Kethuda:

- Kuro, lî vi gîdiyê xîm, got. Tevî ku xencera wî (peyayê Kurd) dî balifa Yusuf Kethuda da çikilandi mabû jî, wî dest avêt şûrê xwe û kesên ku bî serda hatin parçe kîr. Dî dawiyê da merivên ku bî serda hatin, wî Kurdê bî derbeke xeter birindar kîrin. Her weha şereki dijwar dî navbera seyê har ê Kurd, ku êrişî der û dor dikîr, û eskeran da heta ber konê Paşa dom kîr. Gava hatin ber konê Paşa, bîst hev-alên wî Kurdî jî keminan derketin û jî bo xelaskîrîna hevalê xwe, bî şûr û rîman êriş kîrin. Dî meydana navbera konê Yusuf Kethuda û Paşa da bî sedan esker jî konan derketin. Pîştî şereki dijwar - ku ev Kurdên han ketbûn nav deryayek esker-hemû lî serê wan piçîkin, wana parçe parçe kîrin û serê wan avêtin ber konê Paşa.

Xwedê zane min dî rêwitiya xwe da gelek şervanên mêrxas dit, lê ev Kurdên han mêrxasên pîr jêhati û bêaman bûn. Tu nabêjî ev kesên han, jî Xanê Bedlisê nimetan (mal û mulk) stendine û peyman çêkirine da ku piştî mirîna wan jî zarokên wan ra meaş bête girêdan. Her weha ev Kurdên han bî iddiaya mêrxasî serê xwe danine vê rêyê û jî bo şehîdkîrîna Paşa hatine. Paşa, vê bûyerê dî konê Mihemed Beg da bîhist û êdî nema ku jî koneki here koneki dî, zirxê piştî xwe jî xwe derxe.

Rojeke Remezanê Paşa, tevî hezar eskerên bijare çû temaşa başûra metrisên Xan û min jî bî xwe ra bîr. Bî qasî gewda fil kom bî kom kevîrên merm-er, bî qasî qubeya hemamê zînar hebûn. Bê hesab çal û birên wek cehenem, kaş, çaparîz (karê ku meriv nîkare jî heq derê) çêkirin bûn ku layiqê ditnê bûn. Bî kurtî "jî bo ku Osmanî bî hêsani nemişin" wisa bî fen û şeytanî darên dirêj, şikestekan, çerx-felekan (fişekeke ku gava tê vîxistin lî dora xwe dîzvîre û çîrisk davêje) û jî bo parastîna Bedlisê bî çaparîzên qat qat bajêr dorband kirîne, newala Bedlisê kirîne wek şîverêyeke teng, hemû metrisan jî tîjî peya kirîne.

Xuya bû ku gotinê dilên bînya Tatwanê rast bû. Jî xeynî Kurdên ewqas bî fen, newal û qotên (tepeyên) Bedlisê hatibûn girtin û xelk lî serê qota raweşiyabû. Dî devê newalan da bî hezaran peyayên çekdar lî nav hev qelîbûn, bî cûre cûre qulûbe û konan çiya xemulî bûn.

Gava paşa ev deryaya merivan dit:

"Jî me kî jî van merivan dilekî bine ez ê sed zêr bîdimê." got.

Eli Xanê Mehmûdiyan, hema wê gavê:

- Melek Paşayê min, tu dua bike ez ê merivekî binim, lê bî wî şerti ku tu wî nekuji, got.

Paşa jî:

- Ez nakujim, got û Eli Xan tîvinga xwe da destê xwe û çû. Bî qasî ku meriv çavê xwe bigre û veke, lî pêş çavê me hemûyan gihîşt metrisa Xan û derbasî wê derê bû, tevî merivekî cardin derket holê. Tevî wî merivê hat pêşberî Paşa û zemin maç kîr.

Paşa jî wî merivî pîrskîr:

- Kuro, ka bêje halê eskerê Xan çawa ne?

Zîlamê sîpehî:

- Halê me û halê Xan ê xerab, halê kûçîkan e. Jî roja ku hûn hatine ser textê Wanê, em wek kûçîkan "ha wê iro şer bibe ha wê sîbê bibe û ya jî text ya jî bext em ê rîzgar bîbin" dibêjin û dî wî çala ku wek agirê cehnumê ye jî bo çend quruşan jî seknê bêzar bûne. Gelek kesên ku fîrar kîrin jî alî Xan va hatin kuştin. Hatina we, me û Xan bîre helakê. Hetta, do hemû eskeran avêt ser bax û baxçê Xan û hemû zexira wî bîrin, jê ra yek tene genim nehiştin. Xelk dî halekî perişan da ye, birçî û muhtac e. Jî paşva jî eskerên Diyarbekîr bî gure gur î! Hemû eskerên Xan, bî hawar û zare zar in.

Gava Paşa van xeberên xweş bîhist, deh zêr da wî merivî û wî azad kîr. Sozê ku dabû Eli Xan -ku dilekî girt û anî- bî cih anî û sed zêr dayê. Gava vegeriya ku here konê xwe dî rê da mêrgeki dit, "em numêja esrê bîkin" got û jî hespê xwe peya bû û bî min azan da xwendin. Pîştî nimêjê berê xwe da qiblê:

- Ez ê dua bikim, hûn jî bêjin amin, got. Du rekat numêj kîr, serê xwe vekîr, destê xwe dî rûyê xwe yê pîroz da û got ku:

- Îlahî qudret, qewet, serfirazî û fersend yê te ye. Çêyî, alîkari, rênişandan, qudret û mezinahi yê te ye. Min jî bo dinê îslamê komek ometa Mihemed daye dî xwe, destê xwe dîdim ser rûyê xwe û jî bo rîcayê hatime ber derê te. Qûlê te Ahmedê feqîr lavakarê te yê kevn e, te qet wî destvala neşandiye, tîştên ku dikî jî bo me alîkari ye. Disa jî Xwedayê xwe yê ku qadîrê her tîştî ye daxwaziya min ew e, ku tu vê rîca Ahmet jî qebûl bîkî û ewqas insani lî erdê nehêlî, van Yezîdiyên bêqîmet şa neki.

Pîştî van lavayî û nalînan jî çavên wî yên şîl dîlop bî dîlop hêstîrk dîbarîyan. Pîştî ku hemûyan jî duayan ra got amin destê xwe dî rûyê xwe da:

- Mîzgîna lî we lawên min, dua û daxwaziyên me lî meqamê çêyiyê yê mezin hate qebûlkîrin, bî alîkariya Xwedayê mezin em ê bî serkevin û zafer a me ye, got.

(Gername, cild IV, rûp: 198 - 214)

# ÇEND ÇARÎN

## BARAN

Jî behran derbaz bûm, jî çem û çîyan, lî dinyayê geriyam  
Jî diwarên zindanan, şeverêşan, lî ronayê geriyam  
Pez dit bî dû gurê xwe dibezin, birçî ku têran xudi dîkîn  
Lî bostanê gej-boman, ez wek dinan lî edlayê geriyam

\*\*\*

Ne bes e jî te ra ev roj, ba û baran, erd û emr?  
Av û nan, şîer û kîlam, evin, zanin û huner?  
Bo çî ye ev hêrs û kin, zulm û teda, şer û şîn?  
Mîrovê, şarevano, meymûna bî şûr û xençer!

\*\*\*

Jî mîn ra heval divê, xîzmetkaran çî bîkîm  
Yek cîl û yek mal divê, koşk û qesran çî bîkîm  
Ka çî heye hêjatîr jî aşî û azadî  
Mîrovê delal divê, şehriyaran çî bîkîm

\*\*\*

Ku dî ser daristanê da girtin baz û eylo  
Goştê bîlbîlê erzan dibe, hevalo  
Bazara din û boman e, aqîl lî gumane  
Tu hati şîeran pêşkêş dîki, ha hoo!

\*\*\*

Bî dû mal û pûl, bomo, te revand xezneyên dinê  
Dengê avê û bê, bihna gulanê, rengên ilonê  
Bextewari û delalî bî zêr û ziv nayê kîrin  
Mîrovi bî aqîl û zanin, hîs û raman tê pivanê

Serokeki Bijare Yê Tevgera Kurdi Ya Netewi bû..


## DR. EBDUREHMAN QASIMLO

Sekreterê Partiya Demokrat a Kurdistan-Iran Dr. Ebdurehman QASIMLO û endamê komita nawendi Ebdullah Qadiri û kurdek ji Kurdistanê Iraqê Dr. Resûl lî Viyanayê, di roja 13 Tirmeh 1989'an da ji alî rejîma Iranê, bi bêbextî hatine qetilkirin.

Dr. Qasimlo û Qadiri, ji bo rawestandina şerê Kurdistanê bi heyeteke İrani ra, maleki da dan û stendin dikirin. Dr. Resûl jî, di wê hevdişinê da navbeynvanî dikir. Di wexteke hevdişinê da diplomatê İrani, bi mana anina hîn tiştên vexwarinê deri vedike û mirdaran berdide hundir. Mirdar, bi çekên otomatîk Qasimlo û hevalên wî gullebaran dikin û di cih da dikujin. Ev xebera reş di nav gelê Kurd da dilêşiyeye pîr mezin çêkir. Herweha dostên wî kesê aşîxwaz, azadixwazên cihanê jî pê xemgîn bûn û ev qetliyama hanê protesto kirin.

Bi şehîdkirina Dr. Qasimlo, tevgera Kurd a netewî di hemû parçan da zirareke pîr mezin di. Ji ber ku: Ew kadroyeke siyasetî yê bijare, berhemê salan bû. Merivêki dilpak, xebatkar, zîmanzan, entelektuel û mamostayê şoreşê bû. Jiyana xwe jî bo rîzgarbûna welat da. Ew, çî bi nûneriya xwe çî jî bi sekreteriya xwe di her qedemê da bi serfirazî têkoşiya. Di meydana şer da li hember dijminê kolonyalist bi camêri şer kir.

Di bin serokatiya Dr. Qasimlo da PDK-î, ev deh sal bû ku şerê çekdari dimeşand. Bi rêberiya Qasimlo, parti li hember êrişên dijmin bû senger û derbeyên giran li dijmin xist. Di nav refên dijmin da xofeke mezin peyda kir. Pêşmergeyên partiya Qadiri Mihemed û Qasimlo iro jî, bi canfedayî welatê xwe diparêzin.



*Dr. Ebdurehman Qasimlo (1930 - )*

Gava diroka Kurdistanê bête raçavkirin, meriv dibîne ku gelek bûyer -her çiqas di şert û wextên cûre da derbaz bûn jî, jî hîn aliyên va nêzikayîyê didin hev ku rasti jî ew tekrar in. Di diroka gelê me da li ser bêbextiya dijminê me gelek nîmûne hene. 60 sal berê Sîmko jî bi wî awayî hat xapandin û kuştin. Lê pîr mixabin, encama wê bûyerê jî dide xuyan ku tevgerên Kurdi jî tecrubeyên derbazbûyî ders negirtine!

Bi kurtî meriv dikare bêje ku siyaset û bêbextiya dijminê me tim û tim zora me birîye û em bînetine. Diyar e ku di meydana şer da tenê xurtbûn û hêzbûn tê nake. Ji alî siyasetî va jî, siyaseteke jir û zîrek pêwîst e. Divê meriv wek taktîk, di propagadyê da jî

bo tedbir û amadekirina qeweta xwe, her çiqas dijmin xurt nişan nede jî, hêzên dijmin rind nas bike û li gor wê jî taktîk bimeşîne. Lê wisa xuya dike ku wan jî niyeta dijminê xwe baş fam nekirine. Ji bo çareserkirina aşîtiyê, bi dijmin bawerî anîne û bi wan ra bê parastin û bê tedbir rûniştine. Ev tişt safî ye, dûrmeditin e. Bi dijmin bawerî nabe. Meriv jî xwe pîrs dike: Gelo jî xeynî Qasimlo kesekî din tune bû ku bi komita İrani ra rûnê? Ya duduwan: Çima hevdişin li Kurdistanê yan jî li cihêki ku dikaribin kontrol bikin çê nebû?

Kek Qasimlo û hevalên wî, bi namerdi li ser masa aşîtiyê, di rîya aşîtiyê da hatin kuştin. Ev çend sal e tiştê ku dijmin nikaribû di meydana şer da bike, di bin per-



da aşîtiyê da bî bêbextî bî cih ani.

Tu şîk tuneye ku şehîdbûna serok Qasimlo, dî Kurdistanê da, ji ali xebata netewî û demokratîk da valahiyek mezîn çêkir. Ji ber ku ew pêşewayekî zana û têgîhiştî bû. Wî, xwe jî gelek aliyan va çekdar kiribû.

Lê dirok şahîd e ku, gelên bindest carna birinên giran bigrî jî, ew birinên xwe zû dikewinin û di riya rîzgariyê û azadiyê da heta roja serketinê dimeşin. Tu qewetek nîkare têkoşîna wan bîde sekîrandin.

Gelê Kurd jî, heta negihîje azadiya xwe wê têkoşînê bîdomine. Qasimlo, ne şehîdê yekem ne jî yê dawî e. Gelê Kurd di riya azadiyê û rîzgarbûna xwe da bî hezaran şehîd daye. Wê hin gelek şehîdên din jî bîde. Bîla dijminên gelê me şa nebin. Partiya Qadî Mihemed û Qasimlo xwedî dirokeke kevn û bîngehin e. Wê cihên şehîdên xwe zû dagîre û birinên xwe zû bikewîne. Gelê Kurd, wê zû an dereng Kurdistanê azad damezrine û tola hemû şehîdên xwe bîstine.

## Jiyan û Têkoşîna QASIMLO

Qasimlo, di sala 1930 lî bajarê Urmiye jî dayîka xwe bû. Xwendina xwe ya pêşîn û navîn li Urmiyê û Tahranê temam kir. Di xortaniya xwe da, damezrandin û hilweşandina Komara Mehabadê dit. Ew bûyera diroki, li ser wî tesîreke mezîn peyda kir. Çiriskên Komara Mehabad, wî ronî kir û bayê azadiyê bawerên wî şîdand.

Dr. QASIMLO, di sala 1945'an da bî çalakiyê kete nava xebata siyasiyê. Di vê salê da, li bajarê Urmiye Yekitiya Lawan a Demokratîk Kurdistanê damezrand. Salekî piştî têkçûna Komara Mehabadê, sala 1948'an da jî bo xwendinê derket dervayî welatê û çû Çekoslovakya. Li zanîngeha Pragê lîsansa zanîstiyê wergirt. Dema ku hukumeta Dr. Musaddîq di 1952'an da hate ser hukum, Qasimlo vegeyî Iranê. Di Iranê



da, bî qasî 5 salan geh bî dizî geh jî aşkera xebatî kir. Ji ber rewşa siyasiyê, careke din mecbûrî derketina dervayî welatê bû. Di 1962'an da şehadetname zanîstî û aborî wergirt û di zanîngeha Pragê da 8 sal mamostatî kir. Di sala 1970'an da cardîn vegeyî welatê û li hember dîktatoriya Şah, di nav gel da xebatî kir. Ji bo xurtkirina partiyê hewl da. Tevî hevalên xwe, stratejî û taktîka partiyê amade kirin û di 1971'an da rava konferansa sêem kirin. Ev esasên programa partiyê, di kongra sêem 1973'an da hatin qebûlkirin. Di vê kongrê da Qasimlo, wek sekreter hate hilbijartin. Wî heta roja mirinê ev karê han bî serbîlindî meşand.

Di navbera 1976-78'an da, li Parisê di Zanîngeha Sorbûn da, li ser edebiyatê û zîmanê Kurdî dixebitî.

Piştî ku di sala 1978'an da rejîma Şah hilweşîya ew jî vegeyî welatê. Wê demê, di nav gel da daxwaza azadiyê û demokrasiyê zû belav bû, û bîngeheke fireh girt. Di wextekî kî da PDKÎ bû pêşenga hereketa netewî di Kurdistanê da. Partiyê xwe eşkere kir û jî bo mafên netewî û demokratîk propaganda xurt kir. Gel di bînan baskê partiyê da cihê

xwe girt. Di gelek herêman da hukum kete destê partiyê. Bî direktîfên partiyê gel xwe bî çek kir û li dor partiyê xwe da hev.

Lê pîr neborî rejîma melleyan jî wek rejîma Şah xwest bî darê zorê gelê Kurd dil û hêsir bigre. Partiyê pêşengîya şer girt destê xwe û riya rîzgariyê rawayî gel da. Ji sala 1979'an pêda, li hemû navçeyên Kurdistanê, li hember dijminê şerê çekdarî dest pê kir û iro jî berdewam dike. Qasimlo wek serokê partiyê 10 salan rêberîya partiyê kir û li hember dijminê şoreş meşand.

Qasimlo, di nav tevgera netewî da, merîveki xwedî navê deng bû, û pîsporeki siyasiyê bû. Di warê navnetewî da jî xwedî navê rûmet bû.

Wî du zaravên Kurdî (Kurmancî û Soranî), Farisî, Erebi, Tirkî, Fransî, Çekî û Rûsî baş dizanibû. Bî mana peyvê ew ronakbireki gihîştî bû.

Qasimlo emrê xwe jî bo azadiyê û rîzgariya Kurdistanê da. Gelê Kurd xebatê û keda wan jî bir nake, û wê wan di nav refên Şehîdên Kurdistanê da bîde jiyandin.

MUNZUR

# Sistema Şaxê Stranên Gelêri Yên Kurdên Ermenistana Sovyetê

Nûra CEWARÎ

Yek jî watîniyên herî giring jî bo lêkolîna muzîka gelêri ew e ku, şaxê stranan bêne aşkerakirin (derxistin) û sistematîzekirin da ku bêtir lêkolîne hêsantir bike, xusûsiyet û stilên wan bide kifşkirin. Jî bilî viya pêwîst e ku sistemeke weha jî bo lêgerîne alîkari bike, da ku bêtir û firehtir minakên folklorê bicivîne.

Xuyaye ku folklorê Kurdi ya bê muzîk jî çend şaxan pêk tên û her yek jî wan xwedî manekî civakî ne. Çavneriyên me mecal dîde ku, di stranên gelêri da jî jî hevveqetîn heye, ku ev şaxên han di warê dîrokî da wek Stranên Gundîti, Stranên Aşûgî, Stranên Bajari û Stranên Tesewîfî tên xuyan. Ev stranên han jî, di jiyana gel da ne wek hev in. Jî vana yê ku bêtir bala gel bî awakî hissi dîkşîne, Stranên Gundîtiyê ne. Jî ber ku gelê Kurd bî jiyana gundîti va pîr girêdayî ye, muzîkeke pîr giranbuha efrandîye û ew muzîk him bî awakî fireh ruhû wi yê netewî dîde rawekirin him jî mecala efrandîne û xusûsiyeta sîn'etê dengbêjî dîde xuyan. Lewma, gava ku em behsa giringiya muzîka folklorî ya Kurdi dikin qesda me stranên gelêri yê gundîtiyê ne.

Lê belê jî aliyê intresa îlmî va, şiklê efrandîne yê dîn jî xwedî qîmet in û ne tenê bî mana xwe yê civakî her weha bî xusûsiyetên xwe yê muzîk û helbest jî, jî hev tên cudakirin.

## Stranên Gundîtiyê

Em gihîştin wê encamê ku, em dîkarin van stranan weha bîdîn xuyan: Wek stranên xebata jinan, stranên cejnê, stranên malbatî, stranên qehremanî (Dîmdîm), stranên destan, stranên dîrokî, stranên evînî, stranên dilanê û stranê zarokan.

Jî stranên jinan ên xebatê, me sîrana dewkulandîne (Kilkil) û teşîrîsiyê (Wer Dolabê) nivîsi. Naveroka van stranên han xweş tên famkirin û hêsan in.

Ev stranên han di wextê xebatê da, di karê kevaniya malê yê rojane da tên xwendin û wd.

*Her dolavê, dolavê  
Bû şinginya dolavê.*

*Dolava dari merxê,  
Her dolavê, dolavê*

*Yê rîstî pırça bexê  
Her dolavê, dolavê.*

*Dolava dari jî darê  
Her dolavê, dolavê.*

*Yê rîstî pırça karê,  
Her dolavê, dolavê.*

Dî van stranan da ritma sereke, ku destpêka xwe jî livîna (hereketa) kar distîne, -jî aliyê helbest û muzîk va-girêdayî xusûsiyeta avakirin û stîla tîksta stranê ye: Stranên weha bî vegerin hatine sazkirin û melodiya

stranê ji, li gor vegerina stranê ritim dîstine; têkiliyên navbera ritmên deng û harmoniya wan gelek hêsan in.

Dî navbera stranên xebatê û yên din da (stranên dilanê, jiyana malbati, qehremani (Dımdım) û stranê zarokan) prensibên şirik yên forma avakirinê, wekhevîbûna ritma dans, livin û meşê ne û vana dî grûbeki da dîgihjin hev.

Stranên çavnêriya zarokan, aşkirina zarokên dergûşê (Lori) û stranên pêkeninê, dikevin grûba stranên jiyana malbati. Ev stranên han li ser zarokan wek lori, yari (henek) û hiviv hatine gotin. Dî nav van stranan da stranên lori, zehmet in, ne tenê bî mana çespendinê her weha bersiva aşkirina ruhê jinan û pêwendiyên rastiya dorhêla wan ji dide.

### Stranên Dilanê

Stranên dilanê (govendê) dî jiyana gelê Kurd da bêtir cih girtine. Naveroka van stranan, evin û yari ne.

*Hewşa me hewşa we da,  
Wey lûr, wey lûr, wey lûr,  
Hewşa me hewşa we da,  
Her govendê, govendê.*

*Derê hewşê gulbê da,  
Wey lûr, wey lûr, wey lûr,  
Derê hewşê gulbê da  
Her govendê, govendê.*

*Mın te dibû xewnê da  
Wey lûr, wey lûr, wey lûr,  
Mın te dibû xewnê da,  
Her govendê, govendê.*

*Dilê mın xuşka te da  
Wey lûr, wey lûr, wey lûr,  
Dilê mın xuşka te da,  
Her govendê, govendê.*

Dî stranên dilanê û bî gîştî dî stranên bende-bend da piri caran peyv, hevok, bendên li hevvegerandinê,

yên ku naveroke dîdın xuyan, ji hev cuda ne û hevtêkiliyên wan zehmet in.

### Stranê Zarokan

Stranê Zarokan, stranên şahiyê ne û bî naveroka xwe ne ciddî û dagirti ne. Ji ber ku bî şertên taybeti yên rastiya dorhêlê va girêdayî ne. Bî bîngêh û avabûna xwe, dî grûba stranên dilanê da yên herî hêsan in.

**Strana "Kela Dımdım"** dî grûba ew stranan da ye -ku girêdayî livineki standart in- ku ruheki mîrxasi nişan dide. Eposa "Dımdım", dî rûpelê tarixê da mîrxasiya gelê kurd nişan dide. Dî vê eposê da peyv û muzik bî xurtî bî hevra girêdayî ne, qereqtera **marş** dide ku ew ji jî bo bilindbûna ruhê mîrxasiyê hewl dide.

*Ha rabû, rabû, rabû,  
Xan qıral kelê rabû,  
Derabê rawesta bû,  
Silih bejnê ava bû,  
Xencer bejnê duta bû,  
Çev rênga birê mabû.*

*Ha rabû, rabû, rabû,  
Xan Mûkiri kelê rabû,  
Derabê rawesta bû,  
Silih bejnê ava bû,  
Xencer bejnê duta bû,  
Çev rênga birê mabû.*

*Ha rabû, rabû, rabû,  
Xan Evla Beg kelê rabû,  
Derabê rawesta bû,  
Silih bejnê duta bû,  
Xencer rênga birê mabû.*

*Ha rabû, rabû, rabû,  
Xan Avas kelê rabû,  
Derabê rawesta bû,  
Silih bejnê ava bû,  
Xencer bejnê duta bû,  
Çev rênga birê mabû.*

Dî efirandina stranan da, bûyerên herî balkêş dî stranan da tê xuyan. Strandina van tîkstên han, ku bî

naveroka xwe cuda ne, bî melodiye-ke sivîk û piştîre xurt tê xwendin. Bûyereke weha bîngeheke xwe yê genetik heye û bî hêsaniya avakirîna van stranên va jî girêdayî ye. Dî wê rewşê da prensîba lihevhatîna peyv û melodi tê bî kar anîn. Û xelk vana bî hêsani bî kar tine, jî ber ku dî warê efirandîne da gelek jî û dewlemend e.

Bî rewşêke taybetî, stranên Destan orijînal in û pîr xweş in, dî wan da bal lî ser deng tê kîşandin. Ev stranên han, stranên Destan, dirok û evîne ne. Peyvên van stranên lî ser tona deng e û pîr nêzîkî nesir e. Dî van tîkstan da forma çêkirîne digîhîje qafîya mêyî. Dî van stranên da qereqera xusûsiyeta muzîka Kurdi tê rawekirin:

Lihevhatîna, rabûn û daketîna melodiye lî gor rêzên deng diguhurîn. Melodi û gotîne van stranên pîr bî hevra girêdayî ne. Çêkirîna peyvên van stranên bî stileke serbest hatîne nîrandin û pêşdabîrîn.

## Stranên Kurdi yên gelê-ri

### Destan

Ev stranên han, xwedî naverokeke dewlemend in û bî awakî vekirî hisên insan dîde xuyan. Ev stranên han, dî şîrên Rohîlatî da minakên bijare ne. Ew dirok, jîyan, exlaq û mîrxasiya kevî ya gel dîdî xuyan. Dî van stranên da tema herî girîng kerameta insan û sedeqeta evîne ye. Qehremanê van stranên insanên besit, xort û keçên mîrxas in, yên ku gel sîetên îdeal, xurtî û xweşîkbûnek cuda dane wan. Wek "**Mem û Zîn**", "**Siyabend û Xecê**", "**Memê û Eysê**" û hînekên din.

Bî naverok û muzîka xwe ya taybetî, strana "**Mem û Zîn**"ê intreseka taybetî nişan dîde. Strana "**Mem û Zîn**", yek jî folklorî Kurdi yê baştirîn e dî Sedîsala Navîn da. Destana "**Mem û Zîn**" a trajedîk, lî gor exlaqê

Kurdi ên bajarî yên wê demê hatiye nîrandin.

### Zînê dîgo

**Heft dergê bavê mîn, heft jî kolan e,**

**Temam qerebaşî pelewî e,  
Heqê bavê kê heye wê êvarê devê  
xwe bigîhîne xala şîng û beran e.**

### Memê, Zînê tev dane çîra

**şemdan e,  
De wê jîmîrîn, bûn nod û yek  
mînare ne,  
Paşê Zînê qebûl bû, wekî memê  
Ala bûye mêvan e.**

### Qîza wezîr dîgo:

**Memê delal, çîma wa meyî dînazî,  
Serê xwe dernaxî jî bîn vî kurk û  
libasî,  
Qîza qazî, mele çîma jî xwe ra nax-  
wazî?**

### Memê dîgo:

**Ew e dilê mîn dîhevîne -ew Zîn e,  
Cîzîra Bota dîmîne,  
Ew xuşka mîr Sêvdîn e, bûka  
Qeretajdîn e,  
Navê wê Qere Xatûn, nazîk Zîn e.**

Lêkolîne me dîdî xuyan ku em dîkarî gelek şîklên stranên Destan yên nû bîdî naskîrîn, ev jî jî ber ku gel jî van stranên pîr hez dîke û jî nîvşekî digîhê nîvşekî dîn.

## Stranên Mêranîyê

Stranên Mêranîyê yan jî stranên dirokî, dî folklorî Kurdi da cîhekî payebilînd gîrtîye û ev jî bî tevgera rîzgariya netewa Kurdi va girêdayî ye. Stranên Kurdi yên mêranîyê, parçek jî diroka Kurdistanê ne. Ev stranên han jî aliyekî va wek berde-wamiya dirokê ne, jî alî dîn va jî wek dirokeke serbîxwe ne. Gelê Kurdi, van stranên han wek belgeyên dirokî dîzanî, guh danê û parastîne. Qehremanê stranên mêranîyê jî gel in û armanca gel diparêzîn.

muziki û helbest, bî gîştî nêzi stranên Destan in. Cudabûna wan jî yêndîn: Stran bî heyecan û naveroka xwe gelek fireh û pêşketî ne.

Lî ser serûbhatiyên Cihangîr Axayê qehreman, dî nav gel da gelek stran tên xwendin. Ev jî parçeyek jî stranên diroki ne.

*Lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo,  
Axê were meke,  
Maqûlo were meke,  
Tu vê sibê serê şemsê xwe ke,  
Xwe lezekî tetika mirata  
eynelüyêga egle ke,  
Heta, dwê, Yûnisê Çeto tenga hespê  
nava extê vedike,  
Dwê: Heta ciyê nigê Cangîr Axa lê  
dikeve,  
Tu cara geletê usa nake.*

Dî giranbuhabûna xwe û parastina armancên gel da, stranên diroki, dî nav stranên gundiyan da ciheki geş girtiye. Ev ne lêrasthatinek (tesaduf) e ku gel jî van stranan ra rûmet nişan dide û diparêze.

### Stranên Evinê

Stranên Evinê, dî nav gel da bî navê **Stranên Keçika** hatine naskirin. Weki ku tê xuyan sedemê vê navlêkirinê: Jî ber ku zêdetir keç û jin van stranan efirandine û gotine. Stranên diroki berevajiyê stranên diroki ne, jî ber ku bî gîştî stranên diroki jî alî zılamana va hatine efirandin û gotin.

Balkêş e ku, stranên Evini bî qiyas, sazkirin û melodiya xwe va pîr nêzîki stranên Destan û Stranên Diroki ne. Ferqîya stranên Evini jî yêndîn, qerekerî his û dilgermiyeke taybetî ye. Dî van stranan da tema hezkirina insan û tebiyet babeta sereke ye. Melodiya van stranan lirik in, jî ber ku strandina wan melodîk in; bî hêsani tên xwendin û xwedî ritmeke guhêrbar in û wd.

Dî strana "Bêrivanê" da xort, lî ser hezkirîya xwe û hisên xwe distirê.

*Lêlê bêrivanê kulmal,  
kubar-kubar xwe ba neke,  
Wê, ûwê, ûwê, ûwê, ûwê, xwe  
ba neke,  
Hê cêrê xwe hilde kanya pişt  
mala me da qest me neke,  
Ax alîkî cegera mîn sax maye,  
xirab neke,  
yowû, ax dîmîrîm lê.*

### Stranên Kurdi Yên Merasiman (Şin û Şahi)

Straên Kurdi yêndîn merasiman, dî beşa sistema stranên gundiyan da ciheki xusûsi girtiye. Lî gor şin yan jî şahi ev stran, bî qerekerî û avabûna xwe ne wek nev in. Me ev stranên merasimî (rituell) wek stranên dawet û stranên şinê daye nişandan. Stranên dawetan yêndîn ku hatine rawekirin, bî momentên (demên) cuda yêndîn merasima şahiyê va girêdayî ne û jî alî gelek beşdarên merasimê va tên strandîn. Jî van stranan giriyên bûkê, stranên diya bûkê, stranên diya zavê û stranên pesnê zava û wd. Jî van stranan, her stranek lî gor babeta xwe xwedî xusûsiyetekî ye. Lî elî dîn jî, xwedî hîn xusûsiyetên muşterek in, ku ev xusûsiyet jî yekbûna stîla wan tê. Peyvên van stranan, bî qafiya şîrên durêz, sêrêz û çarrêz in. Melodiya strandînê, lî ser notayeke yekser dajo û wek bendebend hatine sazkirin. Bî pîraniya xwe, bî girani tên strandîn û ritmik in. Dî bîngeha van stranan da, harmonî lî ser tona deng e. Dî strana girîya diya bûkê da dilovani heye.

*Xeriba mîn bîrîn,  
Bîrîn, bîrîn, bîrîn,  
Pişt heft çiya werkirîn,  
Gelo bî kuda bîrîn?  
Weyla lî mîn xeribê.*

(Dumahîk heye)

Wergîr jî Rûsî:  
**Azad Hesên Cigerxwîn**

## "WELATÊ MIN DI DILÊ MIN DA YE "

Têkst: Kerstin ERLANDSSON-SVEVAR  
Muzik û Têkstê Stranan: Kenneth STAHRÉ

### Listikvanên Piyesê:

Xort 1  
Xort 2  
Xort 3  
Ferhad  
Lena  
Reşo  
Fatê  
Nalin  
Bav  
Dayik  
Yvonne  
Sino  
Ehmed  
Botan  
Hevalên Yvonne

### 1

(Gava grûba qurre û sergerm tê şanoyê û dans digrin, ev strana han dixweynin)

### Zilamên Bajêr (Stran)

*Gava kovboyên me yê bêedeb nişkava li gund derketin holê*

*Çêtir e hemû dayik zexirên xwe veşêrin*

*Siktir bin, siktir bin!*

*Û eger yek biwêre û li dij derê*

*Wê çaxê em ê bi kêf lêxin heta ku bi xwe da birri*

*Lewra em in qalên gundê xwe, efendiyê wê em in di vi bajari da*

*Siktir bin, siktir bin!*

*Û eger ditineke te yê din hebe, em ê nişani te bidin, siktir be!*

*Di vi bajari da destûra xebardanê ji me tê pirsin*

*Yê ku fam nake em dişkênin pozê wi bi kêfxweşî, siktir bin!*

*Me biryar daye ku ci û warê xwe paqij bikin*

*Tiştê baştirin ew e ku hûn ji bajarê me dûr bimînin!*

*Siktir bin, siktir bin!*

*Wê ev reziliya han tevi xerab, parazit û pisan biqede niha*

*Lewra, gava em di vi hali da bin xulqê me û xebardanê tune.*

*Siktir bin, siktir bin!*

(Parkeki û bankeke rûniştinê. Çend xortên "sergerm" tên hundir, dilzin (dans digrin) û distirên. Xire-cireke dijwar e. Piştî dansê bira vedixun. Ferhat ji deri dikeve hundir.)

XORT 1- Hevalno, binêrin, Ferhad ji wê da têt!

XORT 2- Ferhad ki ye lo?

XORT 1- Yek ji wan Kurdên pis ên ku hatine vir!

XORT 2- Ew ê niha roja xwe bibine!

(Ferhad dertê şanoyê (sehne). Xort bi tehditkari xwe nêzi wi dikin.)

XORT 3- (Qutiyeke birayê davêje ber Ferhad) Wi qutiye rake! (Ferhad ecêbmayî dînihêre) Min ji te ra got ku wi qutiye rake!. (Ferhad serê xwe dihejine û nerazibûna xwe nişan dide) Rake qutiye zebaniyê cehnemê! (Ferhad, di bin vê tehdidê da mecbûri rakirina qutiye dibe)

XORT 1- Siktir be here welatê xwe, serreşê pisê heram!

FERHAD- Te çi got? Ez....

XORT 1- Xeber nede! Me heqê xebardanê da te ku tu xeber didi, hi..? (Nêziktir dibe; yê din ji li dû têt)

XORT 2 - Montê te yê çerm xweşik e! (Bi montê (Saqoyê mêşini) Ferhad digre û digijgijine) Tu zani ku perê vê montê me daye? Perê Sosyalê ji piştî me derketiye. (Tû dike montê, dikşine ku hemû tîfkî, piştî dikşine pêşberî Ferhad) Tîfkê! (Ferhad, gavek xwe paşda dikşine) Min ji te ra got ku tîfkê! Tu kerr i pisê gendel! Tê bi vê montê êdi nîkarîbi keçikên me yê Swêdi ji seri derxi. Lewra tu hergav vi işi diki. İşê xwe bi keçikên me diqedini. (Ji koma xortan du kes, her yek ji aliki va bi girmilkên Ferhad digrin) Tîfkê, hêj ku em hêrs nebûne. (Girmilkê Ferhad berbi jêr ditewinin, bi çena wi digrin û ji bo tîfkî zor didinê) Hi... wisa bi aqil be, tu laweki jir i! Tu ji Swêdi fam diki, serreş. (Li montê dînihêre) Bifikire, heta tûka wi ji wek wi reş e. (Montê davêje erdê. Ferhad dicehdine ku here, lê têt sekinandin.) Na, na, na..., bisekine! Tê bi kuda heri? Tam di wexte ku kêfa me di cih da ye. Hêj listika me tamam nebûye. Tê heri qehwexana reşikên avzêlê xwe bi cih biki, he..? Ji me Swêdiyên bi şeref

KERSTIN ERLANDSSON-SVEVAR:

## "...Min xwest ji bo Kurdan tişteki bikim."

(Me ji niviskara piyesa "Welatê Min Dî Dilê Min Da Ye" Kerstin Erlandsson-Svevar tîka kir ku xwe bi xwendevanên Kurd bide naskirin û wê ji weha bersiv da:)



Ez Mamosta me û li liseya Bollnäs ji bo perwerdekirina insanên gihiştî darsdariya Swêdi dîkîm. Meyla min li ser xwendin û nivisînê heye. Ez, deh sal e ku bi hevaleki xwe ra bi Swêdi pirtûkê dersan dînivîsim. Lê nivîsina piyese, ji bo min herî tiştê xweş e. Komeke min û Kenneth Stahre ya tiyatroya muzikal heye. Dî vê komê da 30 zarok beşdar in û ez ji bo wan piyese dînivîsim (heta niha 7 piyese). Min ji bo mezînan ji gelek piyese amatori nivîsiye, ku yek ji wan "Welatê Min Dî Dilê Min Da Ye" ye. Fikrê nivîsina vê piyese, bi saya pêwendiyê min û Kurdeki, ku li ba min Swêdi dîxwend, çêbû. Tiştê ku ev i Kurdi ji min ra behs kir, li min tesir kir û bi vi awayî min xwest ji bo Kurdan tişteki bikim.

- Me vê piyese li Bollnäs û derdora wê, li Stockholmê nişan da. Gelek bajarên din ji, dîxwazîn vê piyese bibînin. Belki em payîzê piyese cardin bilîzin.

ra û di cih nemaye. Tu pê dizani hî?.. (Mîl li Ferhad dixê) Tam weki kafiyayê Kurd e. Li vê derê ji bo qûna Swêdiyê rasteqin kursiyek nemaye. Reziliyêke mezîne.

FERHAD- Rica dîkîm, dev ji min...

XORT 1- Rica dîki! hî.. hî.. hî.. We bihist hevalno! Rica dîke! Qesta wi ev e ku ji min rica bike. (Hemû bi tînaz dîkenin. Xort desteki xwe davêje stûyê Ferhad û bi şeytani dîkene, stûyê Ferhad dîjdine heta ku ji êşa rûyê wi tîrş dibe)

FERHAD- Ez dîkarîm...

XORT 1- Bibê "ez rica dîkîm", bi vê hawê li xweşa min diçe. Wisa nine hevalno? (Hemû serê xwe dihejinin û dîkenin)

FERHAD- Rica dîkîm, bihêlin ez herîm!

XORT 2- (Derbeke li pîştî Ferhad dixê) Xwe li ber me bitewîne pisê heram! Nexwe ez ê cardin çena te bişkênîm. (Kulma xwe dide binê çena Ferhad û wi tehdîd dîke)

FERHAD- Biheîlin ez herîm. (Ji bo xweparastîne dîcehdîne)

XORT 2- Tu lê binêre, tu radîbi piya. Tê bibîni cardin. Te dî xewna xwe da dîtiye ku tê li xorteki Swêdi xi, tê çawa cesaret bîki hî... Serreşên pis ên şerkar. (Kulmeke dadiweşîne Ferhad)

XORT 3- Tu dibê qey şeytan e! Kutan ji dîxwe lê dengê xwe nake. (Pehînek li zîkê Ferhad dixê)

FERHAD- (Ferhad destê xwe dîke wek mertal û xwe diparêze) Dev ji....

XORT 1- Berxwe bîde, reşîkê pisê gendel! (Li Ferhad dixê û wi davêje erdê; Ferhad xwe ji destê wi piçek xilas dîke, lê xortên din dû wi bernadîn û

lêdanê dîdomînin. Dengê kulman, qîrin û xîre-cîr tê bihistîn)

XORT 2- Benke! Dev jê berde, bes e. Yek ji wê da tê. Hadê em herî. (Lena bi bez tê, li kêleka bankê dîsekîne ji bo ku bihna xwe bîde; wê gavê qutiyên bîra li der û dor dibîne û dengê nalîna Ferhad dibîze, ku Ferhad dî haleke perîşan da ye û dîxwaze xwe bigîhîne bankê. Lena bi lez berpê diçe, mîlên wi digre ku wi rake ser lîngan)

LËNA- Ev çî ye, çî bûye?

FERHAD- Tişteki tune, ne tişteki wisa xeter e. (Lena stran dîxwîne)

*Merîvek çawa dîkare tiştike weha bike  
Ki dîxwaze bi vi hawê yeki birîndar bike?*

*Ez tenê bi mêzekîrîne nîkarîm bîsekînim û li vê dijîminatîya han binêrim.*

*Yên ku li der û dor tîm zorê bi kar tînin  
Xuyaye ku ne insanên temam in.*

*Gelo ew ê poşman bibî yan ji wê vê xerabiyê ji bir bîkî?*

*Gerek tu birînen xwe nişan bîdi.*

*Ez çawa dîkarîm alîkariya te bîkîm?*

*Tê bîkarîbi tena serê xwe herî yan ji ez alîkari bîkîm?*

*Rabe ser xwe û xwe bi min va bigre.*

*Ez tînagîhîjim ev çî ye ku dîbe,  
Berê vê derê cîheki bêdeng bû.*

*Meriv dîtirse û dîkesîre*

*Gava tişteki weha dîqewîme.*

Gava tu li piya yi êşa te pîr e?  
Belê, hêj ji xwin ji çend birinan tê.  
Were, em hêdi hêdi ji vir biçin.

## 2

(Li oda rûniştinê, li ba apê Ferhad Reşo - ciyê ku Ferhad li wir dimine- Li deri dikeve.)

FERHAD- Ez ê deri vekim. (Ji odê derdikeve ku deri veke)

LENA- Roj baş Ferhad! Oo... tu hati ser xwe niha! (destê xwe li rûyê Ferhad digerine.)

FERHAD- Belê, pîraniya birinên min baş bûne, êdi meriv dikare here der û xwe nişani xelkê bide. (Ferhad berê xwe dide odê û dibêje) Reşo, Lena hatiye. (Reşo, Fatê û Nalin tên hundir)

FERHAD- Evya Lena ye.

LENA- Roj baş!

REŞO- Roj baş Lena. Navê min Reşo ye û ez apê Ferhad im. Evya jina min Fatê ye û ev ji keça min Nalin e. (Ew pîrsa hev dikin)

REŞO- Em gelek spas dikin ku te alikariya Ferhad kir. Gava ku hûn bi hevra hatin malê, em wisa li hev şaş bûbûn ku çavê me te nedit. Niha em dixwazin bi dil û can te nas bikin. Ji ber vê yekê ye ku me ji Ferhad ra got da ku te daweti malê bike. Hûn diçin eyni dibistanê?

LENA- Belê, lê me hevdu nas nekîrbû.

FERHAD- Na, min te ditîrbû..., gelek caran. (Lena bi şermizari dibîşiri)

FATÊ- Keremke li vê derê rûnê. Em dikarin ji te ra çay ikram bikin?

LENA- Belê, spas. (Tevi yên din rûdîne. Fatê çay tine. Nalin, bi meraq destê xwe li ser qolya wê digerine)

NALIN- Ez dikarim bikim stûyê xwe?

REŞO- Nalin, Lena rehet bihêle!

LENA- Fermo, bike stûyê xwe. (Lena qolya xwe dike stûyê Nalin. Nalin li navê dilize û li xwe dinihêre.)

LENA- Tu keçîkek pîr delal i! Eger tu bixwazi, bila ji te ra be.

NALIN- Ooo... gelek spas, tu çiqas baş i! Wê çaxê gerek tu ji tişteki ji min bistini. (Nalin şareke xweşik tine û davêje stûyê Lena)

LENA- Oyy... çî xweşik e! Tu nikari wi bîdi yeki din.

NALIN- Belê, ez dikarim bîdim, ne wisa bavo?

REŞO- Belê, ez dixwazim ku Lena şarê bistine. Ew şar ji gundê me yê biçûk ê Kurdistanê hatiye.

LENA- Spas, Nalin. (Nalinê bersing dike. Fatê tê hundir û çay datine.) Ferhad! divê ez pîrsa tişteki ji te bikim, te tu xeber ji kesên ku te

êşandin stend?

FERHAD- Na, em tu tişteki nizanin.

REŞO- Me gliyê xwe gihande polês, lê me tişteki nebîhist. Em tê nagihîjin tişteki weha çawa dibe. Ev nêzi 6 sal e ku em li vê derê rûdînen û bir û baweriya me ew e ku pîraniya insanên vê derê, alikariyxwaz û bî fam û fîraset in. Lê eger wan şerxwazan bîditana ku min çî dit û jiya, diviya wan li hember insaneki wek xwe dest ranekirana.

NALIN- Zarokên dersxana min gelek baş in. Tu dixwazi li fotoxrafê min ê dibistanê binihêri?

LENA- Belê. (Nalin diçe û radîke fotoxraf.)

FATÊ- Fermo! (Çay datine ber Lena) (Nalin fotoxraf tine û tê)

LENA- Divê evya tu bi, Nalin. (Nalin, di mana herêkirinê da serê xwe dihejine)

NALIN- Evarîa hevalên min yê herî baş in û ew gelek şerûd in.

FERHAD- Belê pîraniya wan baş in, lê ez bawer im ku gelek kes bi halê me yê Kurdistan nizanin. Belki gelek jê bihistine, lê tevi viya ji ew fam nakin. Ew wisa dizanin ku em ji halê xwe yê vê derê xweşik in. û rast e, halê me yê vê derê xweşik e, lê hesret... ew me diêşîne. Em bi welatê xwe û merivên xwe va girêdayî ne, ev ê wê derê ne, bi welatê xwe va.. (Ferhad distirê û yê din ji pêre dibêjin.)

*Tişteki Dî Bayê Da*

*Tişteki dî bayê da gotinê vedîşêre.*

*Gotin naxwaze jiyana xwe fam bike.*

*Jiyan tam û qeweta xwe ji axê distine,*

*Li ser wê axê zarokek hîni avêtîna gava ewil dibe.*

*Hesret carna bi taybeti zor e,  
bêrikirîna gelê xwe,  
welatê dayikê.*

*Ba divizîne wek her gav.*

*Tevi wi ji, ji yek gotinek fam nakim.*

*Tariya jiyana min pîr zêde mezin e.*

*Guhê min, dengê azadiyê dibihîze, ez diçim.*

FERHAD- Ez dizanim ku ez ê rojekê paşva bîzvîrim.

LENA- Lê vegera te ne xeter e? Li te digerin.

REŞO- Belê xeter e. Ji ber wê yekê ye ku em li vir in. Em dixwazin bijin.

LENA- Reşo, tu nikari ji min ra bibêji ku hûn ji bo çî revîyan. Ez dixwazim fam bikim.

**(Dumahîk hej. tê)**



# DISIPLIN

ANTON MAKARENKO

Werger: DILSOZ

Tarifeki baş jî bo rejimeki, xusûsiyeta sereke ya duduwan e. Eger iro diran tèn firçekirin, divê ev karê han dotıra rojê jî bête domandin. Eyni tışt jî bo keyskirina nivinan jî pêwist e. Divê dayik, her roj eyni tışti bibêje. Bêberpırsiyariyeke weha tu maneki jî rejimê ra nahêle. Dî navbera talimatan da pevgirêdanek namine û dıkevin rewşeke çawa lê hati. Rejimeki baş, bî xusûsiyeta xwe ya tekûz (bî denge) jî yê dîm tê veqetandin. Gava pêwist be, gerek rê jî tıştên ne normal ra jî hebe. Bî gelmeri divê dî her malbati da rejimeki wisa bête sazkin, ku dî rejimê da tu terk çenebin. Divê zarok, jî pır biçûkayi va dî bîm kontrolê da bîm. Dê û bav çiqas şiyar bîm jî rêderketin jî ewqas kê m dibîm û her weha pêwist nake ku meriv car bî car cezayan bî kar bine.

Em ê bala dê û bavani bıkşinin ser vê babetê. Gelek dê û bav dî nav şaşiyeki da ne. Biçûkê malê vê sibê ciyê xwe keys nekır. Pêwist e ku meriv dî vi wari da tışteki bike? "Berya her tışti gerek jî bo tışteki weha zarok neyên acızkirin." Ev ditin şaş e. Dî perwerdegariyê da tışteki negiring tune. Ciyeki nekeyskirî işareta peşmürdetiyê ye, bî wê işareta biçûk-ditina sistema sazkirî, destpêka tecrûbekirinê ye. Pıstre lî hember dê û bav serhışki dest pê dıke.

Eger dê û bav dî vê babetê da ne bî

dîl û can bîm, jî vê rewşa zarokan ra çav bıgrın, dî eyni wextê da ne xwedi jiyaneki tekûz bîm û jî rejimê dîr bikevin dibe ku armanc û xeta rejimê, neguhartina wi, xusûsiyeta wi yê zordayinê wında bibe. Bêşik rejima ku zarok bî kar tinin jî ya dê û bav cudatır e lê gerek jî ali prensiban va ferqi nişan nede. Eger we, lî ser xwarinê xwendina pirtûkan qedexê kırıbe, gerek ev tışt jî bo we jî qedexê be. Eger hûn dıxwazın, zarokên we berya xwarinê destên xwe bışon gerek hûn jî eyni tışti bıkın. Ciyên xwe bî xwe keys bıkın. Evya ne tışteke zehmet û şermkirinê ye. Ev detayên biçûk jî texminan jî zêdetır gring in.

Divê rejima malê xwedi van prensiban be:

Gerek wextê razan û rabûnê bête tesbitkirin. Ev babeta han hîm jî bo roên tatil hîm jî jî bo rojên xebatê ye. Paqıjiya kinc û laşê meriv, dî kujan roj û rewşî da wê çek bê guhastin, wê çawa bîm paqıjkirin. Divê zarok her tışti bî awaki tekûz hin bıbın, pışti listik û xebatê gerek her tıştên xwe bî keys deynin. Gerek zarok, jî pır biçûki va bıkaranina tuwalêtê, destşokê û serşokê hin bıbın, haj jî elektrikê hebin, gava pêwist bike bıkaribin lembê vîxın û bitefinin.

Gerek rûmıştın û pergala ser masê bête kıfşkirin. Gerek cihê her zaroki lî ser masê kıfş be, bızamibe bî edeb

rûnê, hini bikaranina çetel û kevçi bibe, rûyê masê (perda masê) qirêj neke. Hewrîkan nerêje, dî teyfîka xwe da tîşteq nehêle, xwarîna zêde nexwaze.

Divê wextê xebata zarok ji bête kîşkirin. Bî taybetî dema ku zarok dest bî dibîstanê dîke, ev tîştê han bî taybetî giring dibe. Berya ku zarok dest bî dibîstanê bîke daxwazî ew e ku xwarîna, listîk, saetên gerê bête kîşkirin. Hîn kes wîsa bawer in ku, ihtiyaciya zarokan bî bazdanê, qirîkîrînê û bî kurtî bî serfîkirîna enerjîyên zêde heye. Bêguman ihtiyaciya zarokan ji mezînan bêtir bî herketê heye. Lê gerek ev ihtiyaci, bî awakî nezani neyê bî cih anîn. Gerek zarok hînî exlaqên baş û pêketî bîbîn û bîzanîbîn ku dî kîjan rewşî da wê çawa bîlîvîn. Gerek meriv dî her rewşî da rê nede ku zarok lî malê bazdîn û xwe hîlbavêjîn. Ew dîkarîna vî ihtiyaciye lî hewşê yan jî lî baxçe bî cih bînin. Jî bîlî vana gerek zarok hînî eyarkîrîna sewta xwe bîbîn. Wek minak em dîkarîna xîrîna, xeberdan û gîrîna wan nişan bîdîn. Vana, jî ihtiyaciye zêdetîr şanê hêrsbûnê ne. Carna berpîrsiyariya qirîna zarokan a bî hêrs, dîkeve ser milê dê û bavîna. Dî şûna ku dî malbatê da rewşekî tekûz peyda bîkî qirînê hîldîbjêrîna.

...Dî nav malbatê da metodên gelemperî yê tekûzkîrîna rejîmê ev in: Bî van rêyên gelemperî yê çareserkîrînê her dê û bav, dîkarîna lî gor xusûsiyetên xwe sistema jîyanê peyda bîkî. Dî rejîmê da şîklê pêwendiyên navbera dê û bav û zarokan gelek giring e. Tûjîtiyên derheqê vî babetê da, dîkarîna bîbîn sedemê gelek şaşiyên cîhê. Evana jî lî serperwerdegariyê heta tu bêjî tesîrek nebaş peyda dîkî. Hîn kes baldayînê lî plana pêş dîgîrîna, hînek tewrê rawekîrînê dîpejîrîna, hînek jî dî warê hezkîrîna, cesaretdayîna, ferman, tawîz, bîbîryarî da tûjîti dîkî. Dî jîyana malbatê da wek her tîştên normal em rastî pêwîstiya gelek rewşên heskîrînê, bîbîryariyê, hev-

peyvînê, cîhêgîrtînê tîn. Dî her rewşên ku behsa rejîmê tî da heye gerek prensîbên rêvebirînê tî da cîh bîgre.

Malbat saziyeke gelek giring e û bî berpîrsiyariyan tîjî ye. Malbat, şahîyeke tîr û tîje dîde jîyanê. Lê dî her malbatî da bî taybetî dî civata Sovyet da ev babeta han bî serê xwe cîheki dîgre û jî nêz va bala dewletê dîkîşîne. Jî ber vî yekê ye ku, gerek dî malbatê da rejîmekî kîşkirî hebe, her bî pêş here, wek saziyekî pratîk wezîfa xwe bî cîh bîne. Divê dê û bav jî rîya pratîk a çareserkîrînê nêrevîn. Gerek nekevîna bir û baweriyekî wîsa ku, evya jî hezkîrîna dê û bavîna ra ters dîkeve, dî pêwendiyên zarok û dê-bavîna da hewayek hîşk û sar peyda dîke. Kîşkirîna metodêk cîddî û rasteqîna, jî bo sazîrîna hevhezkîrîna merivên malbatê pêwîst e.

Divê dê û bav dî nava demekî herî kurt da lî hember herkesî metodêkî bêmeyl, bî encam, aqûbetiyê bî kar bîne. Lê gerek dî iznê xwe yê rojane da tîm bîbîryar bîn xuyan. Gerek zarok jî, jî bîçûkayî va hînî vî rewşê bîbîn. Daxwazîyan bî dîl û can bî cîh bînin. Meriv dîkare hîn tîştê zarokan xweş bîbine, bî wan ra henek bîke, bîleyîze. Lê gava pêwîst be jî, gerek daxwazîya bîcîhanîna tîşteki kîşkirî bête kîrîna. Ev daxwazî xwe dispêre armancekî û divê bête çespendîna, jî ber vî yekê jî gerek hîn dî serî da bî tona dengê xwe baweriyê bîdîn.

Gerek dê û bav pîr jî mêj va, ango gava zarok hêj 1,5 -2 salî ye, daxwazîya bîcîhanîna hîn tîştên kîşkirî jî wan bîkî. Ev ne tîşteki zehmet e. Giring e, ku daxwazîyên we lî ihtiyaciye jêr tîn an nayên:

1- Gerek meriv bî halekî tûre û bî hêrs tîşteki nexwaze, lê divê ne bî awakî lavakî be jî.

2- Gerek jî qeweta zarokan zêdetîr nîbe û daxwazîya cehdeke, ku wê zarok dî tengasiyê da bîhêle, neyê kîrîna.

3- Gerek meriv bî aqîlmendî here-

ket bike, ango nekeve zîdê aqlê selim.

4- Gerek daxwaziyên we û merivên (xîsmên we) we li hev bînhêre û nekevin nakokiyê.

Gava meriv bîcihanina tîşteki dixwaze, divê ew bêqusûr bête bi cih anin. Gerek meriv daxwaziyeki ku pîştî demeki kurt tê ji birkirin neke. Dî malbatê da wek hemû karên dî bîcihanina daxwaziyê û çavnêri çarenin e. Divê dê û bav viya nişani zarokan nedin, ango zarok pê dernexin. Dî gelemperi da gerek zarok dî derheqa bîcihanina daxwaziyên da nekeve tu şîkê Lê gava meriv wezîfeki tevlihev bîde zarokan -lî vê derê xusûsiyeta kar xwedî girîngiyê mezî e- kontroleki hisandmê wê dî cih da be.

Eger zarok daxwaziyên bî cih ney- ne hûn ê çî bîkî? Berya her tîştî divê meriv rê û mecal nede ku rewşeke weha çê bibe. Eger zarok lî dij we rabe, ewil bî tewreke sar tîştê ku jê tê xwestin tekrar bîkî. Hûn dikarin weha bîbêjin: "Mî jî te ra got ku vi kari bike. Lê te nekî. Zû bike! Careki dî tîşteki weha naxwazim!"

Pîştî daxwazî tê kirin û bîcihanin an neanina daxwaziyê tê kontrol kirin, divê hûn lî ser sedemên berxwedanê bîsekînin. Hûn ê bîbin ku her gav jî hîm alîyan va her tîşt wek bir û raya we dernayê, we bûyerê bî şaşîti daye dest, hîm tîşt jî çavên we revinane. Heta jî destê we tê nekevin şaşîyeke weha.

Dî vi wari da nuqteya herî girîng, ku divê meriv lî serê bîsekîne, ew e ku zarokên we lî dijderketinê jî xwe ra nekî exlaq û rejîma malbatê derb nexwe. Gerek zarok pê bawer bîbin, ku daxwaziyên dê û bavî ne tenê bî gotinê ne.

Eger hûn jî destpêkê va çav lî nebaşîyan negrin, hûn tu car mecbûrê cezadayînê nabî. Rejîm jî destpêkê va pêşketîneki baş nişan dîde, eger

dê û bav jî nêrevaniya vê pêşketinê bike pêwîstî jî cezayan ra namîne. Dî malbateki da, ku xwedî şert û zirûfeki baş e, cih jî cezakirinê ra tune. Ev jî bîngeha herî baş a metoda malbatê pêk tîne.

Lê dî hînek malbatan da zanîna perwerdegariyê tune. Wîsa bawer in ku bê ceza ev îş nameşe. Dê û bav bî awakî nezani dest davêjin cezakirinê, dî dawiyê da jî dî şûna ku wê meselê çareser bîkî rewşeki tevlihevtir û bêçaretir peyda dikî.

Çespanîna ceza, bîyareke gelek zor e. Gerek perwerdekar xwedî qabîliyeta hîskirinê be û gelek bî pîvan be. Em şîreta lî dê bavî dikî, ku heta jî destê wan bê xwe jî cezayan dîr bîkî. Divê berya her tîştî rejîmekî kêrhatî hîlbijêrin. Evya wextekî dîr û dirêj digre, lê gerek meriv bî sebir û tebat lî benda encaman bîsekîne.

Eger pîr pêwîst be meriv dikare dest bavêje hîm cezayan. Wek mînak, meriv dikare zarokan jî hîm tîştên kêfê û tîştên ku lî xweşa wan diçe mehrûm bîhêle ( meriv dikare çûndîna sirk an jî sinemayê bî ewîqîne, wan jî xerciyê (pere) jî mehrûm bîhêle, neşîne ba hevalên wan).

Divê em cardî binî bîra dê û bavî ku, eger rejîmekî kêrhatî tune be ceza feyde nake. Dî rewşeke weha da meriv dikare hîm cezayan bî kar bîne. Lê sebreki zêde pêwîst e. Bî kîjan awayî dîbe bîla bibe, dî şûna ku meriv şaşîya jîyana malbatê rast bike ceribandîneke rast girîngtir û kêrhatî e.

Gerek meriv dî warê cesaretdayînê da gelek hesap be. Gerek meriv jî bo xelateki jî mêj va soz nede. Tenê pesîndayîn û hisandîna ecîbandîna karê wan bes e. Gerek şabûna wan, hîm tewrên dîlxweşkirinê û zewq nebî xelata tewrên baş, wek xelata bî feyde yan jî bî xesar nedî wan.





# ZAROK

TOLSTOY

Werger: X. LEZGİN

## Qaziyê Durust

**L**ı Cezayirê sultanek hebûye. Navê wi Bauakas bûye. Sultan bî-histiye ku lı bajareki welatê wi qaziyeki geleki fehmdar û şareza heyê. Qazi wisa têgîhişti bûye, ku derhal rasti fehm kiriye û tu sucdarek bê ceza jı destê wi nefiltiye. Sultan rojekê bıryar daye ku here wê derê û bı çavê xwe bıbine ka gelo rast e yan na.

Sultan dıkeve qılıxê tucareki û lı hespê xwe sıwar dıbe, dıkeve rıya wi bajarê ku Qazi lê dıji. Lı perrê bajêr, parsekeki seqet jı Sultan sedeqeki dıxwaze. Bauakas hınek pere dıde wi û dıke ku bajo û here, hıngê parsek wi dıde sekınandın.

Sultan dıpirse:

" Ê mın pere da te, tu êdi çı dıxwazi?"

Parsekê seqet,

" Te sedeqe da mın" gotiye. "Lê nıha jı daxwazıke mın heyê jı te. Tu mın jı lı hespê xwe sıwar bıki, û heta meydana bajêr bı xwe ra bıbi? Eger tu mın lı vıra bıhêli, ezê dı bıbin piyê hespan û hêstıran da bıperçım."

Bauakas, ev mırovê seqet hıl-



daye û lı pêşıya xwe daye rû-nıştandın, heta meydana bajêr aniye. Sultan hespê xwe sekınandiye, lê , yê seqet nexwestiye jı hespê peya be.

Sultan:

" Va em hatın meydanê. Çıma tu peya nabi?" gotiye.

Parsek:

" Ezê çıma peya bım?!" bı hêrs bersıv daye. " Ev hespê mın e. Tu peya be. Tu dıxwazi hespê

mın ji mın bıstini ne? Haydê em herin mehkemê."

Dema wan weha qelebalixi kiriye, kesên lı wê meydanê lı dor wan cıviyane. Yên ku zanıbûne mesele çiye, ew bona çı şer dıkın, gotine:

"Herin ba Qazi, ewê bızanıbe ka ki ji we derawan dıke, ki rast dibêje!"

Bauakas û parsekê seqet bı hevra çûne ba qazi. Beri wan mehkema du kesên dın hebûye. Qazi, bı dor ew bangi cem xwe kırine. Dor hatiye cotkareki û miroveki pêzan. Ev herdu mirovên han bona jıneki pevçûne û hatine gılikırınê.

Cotkar:

"Ev jınıka han jına mın e!" gotiye.

Pêzan:

"Na, ev jınık jına mın e!" gotiye.

Qazi guhdariya wan herduyan ji kiriye, bı qasi deqıqeki bêdeng maye û paşê,

"Jınıkê lı vıra bıhêlın" gotiye. "Sıbê werın."

Pışti ku ew derketine çûne, dor hatiye qesabeki û tucareki rûn. Kincên qesab serdanpê bı xwin bûne. Kincên tucarê rûn-firoş ji bı rûn bûne. Dı destê qesab da pere hebûne. Tucar ji hışke-hışk bı destê wi gırtiye.

"Mın ji vi mirovê han rûn dıkırı," qesab gotiye. "Dema mın kisê xwe derxıst ku ez pera bıdımê, rahişte destê mın û xwest perê mın gışki ji mın bıstine. Aha ji ber vê yekê em hatın ba te... Mın dixwest ku ez bı kisıkê xwe bıgrım, wi ji dıkır ku ji destê mın derxine. Belê, pere, perê mın e, dız ji ew bıxwe ye!"

Vêca tucar destpê kiriye:

"Gotinên qesab hemû derew in. Ev mirovê han, hat ba mın ku rûn bıkıre. Mın fıraqa wi dagırt. Wi got ezê pereki zêr bıdım te, hırke û perê xwe jê bıgre. Hıngê mın ji perê xwe derxıst ku daynıme ser dezgeh, wi ji nışkava çengek perê mın hilda û xwest ku bıreve. Wek hın ji dıbinın mın bı destê wi gırt û ani cem we."

Qazi, disa bı qasi deqıqeki sekıniye û paşê,

"Bıla pere lı vıra bıminın, hın sıbê werın!" gotiye.

Dor hatiye Sultan. Sultan, doza xwe û mirovê parsek ji qazi ra gotiye.

Qazi, pışti ku guhdariya Sultan kiriye, zıvırıye ser parsek, da ku ew ji behsa bûyerê bıke.

Parsek ji weha gotiye:

"Gotinên vi mirovi ne rast in. Wexta mın ew dit, lı erdê rûnıştıbû. Dema wi ez ditım, rabû berbı mın hat û lava kır ku ez wi bı xwe ra heta meydana bajêr bınim. Mın ji ew lı hespê xwe sıwar kır û heta meydanê ani. Lê wexta em hatın wıra, wi nexwest ji hespê mın peya be. Ū got ku ev hespê wi ye. Bêşık ew derewan dıke."

Qazi disa bı qasi deqıqeki fı-kırıye û paşê gotiye:

"Hespê lı vıra bıhêlın û sıbê werın!"

Rotıra dın, dadgeh mışt tji bûye. Herkes dı vê meraqê da bûye: Gelo Qazi wê çı bıyarê bıde?

Pêşiyê dora cotkar û pêzan bûye.

Qazi zıvırıye ser pêzan û jêra gotiye:

"Jına xwe hilde û here" paşê gotiye "Cotkar bıherın û penci çoyan lêxın!"

Paşê bangî qesab kîriye.

"Pere yê te ye," gotiye. Qazi tucar nişandaye û gotiye "Pênci çoyan lî vi mirovi xîn!"

Piştra dor hatiye Sultan û parsekê seqet.

Qazi jî Sultan pîrsiye:

"Tu dikari di nav bist hespan da hespê xwe nas biki?"

"Belê nas dikim!" gotiye Bauakas.

Qazi jî Bauakas ra,

"Ka were," gotiye û ew hildaye biriyê tewlê. Bauakas, di nav bist hespan da, derhal hespê xwe nas kîriye, nişan daye.

Paşê, Qazi bangî parsekê seqet kîriye, bo ku ew jî were hespê xwe nişande. Jî ber ku parsek jî ew hesp nas kîriye, çûye û derhal nişan daye. Lî ser vê yekê tev veqeriyane salona dadgehê.

Qazi jî Bauakas ra gotiye:

"Hesp yê te ye, bihere" û gotiye "Pênci çoyan lî vi mirovi xîn!"

Dema ku Qazi jî dadgehê derketiye ku here mala xwe, Sultan lî pey wi reviyaye û xwe gihan-diyê.

"Tu çî dixwazi?" Qazi jêra gotiye. "Ma biryara min ne lî gor dilê te bû?"

"Belê, ez geleki pê kêfxweş bûm. Lê ez dixwazim tişteki bîzanîbim: Gelo we çawa zanîbû ku ew jînik, jîna pêzan bû, hesp yê min bû?"

"Ez bêjim," Qazi gotiye. "Dema bû sibe, min mirovek şande pey jînikê ku were ba min. Jînik hat û min jêra got 'bî kerema xwe vi kûpîkê (rengdang) han dagre'. Jînikê kûpîk hilda, hanka paqîş kîr, tîjî murekeb kîr û anî. Ango wîsa diyar bû ku, ew pêşeyê wê bû, îşê wê bû. Eger ew jîna cotkareki bûya, wê nîza-

nîbûya çî bike. Bî vê yekê xuya bû ku, gotina pêzan rast bû. Ew jîna wi bû.

"Em werin ser peran. Min ew perana jî êvar da xîste fîraqeke avê. Rotîra dîn ez çûm û min lê nîhêri ka belekiyên rûn lî ser rûyê avê hene yan na. Tu tişteki tunebû. Eger ew pere yê tucar bûna, hingê belekiyên rûn wê bî ser avê ketana. Madem ew pere paqîj bûn, diyar bû ku ew pereyên qesab bûn.

"Em werin ser doza hespê: Bî rasti, jî bo min geleki dijwar bû, ku ez pê derxîm, ka xwediyê hespê kî ye. Lema min xwest ku hûn werin tewlê ba hespan. Tişteki ku min dixwest ez bîzanîbim, ne ew bû ku, gelo kî jî we hespê nas dîke, na, lê min dixwest bîbinim ka hesp jî we herduyan kî nas dîke. Dema tu nêzîki hespê bûyi, hespê serê xwe berbî te zivîrand, stûyê xwe dirêj kîr. Lê wexta parsek destê xwe da ser pişta hespê, hespê guhên xwe berepaş daxîst û bê xûy bû. Hingê min fehm kîr ku xwediyê hespê tu yî."

Lî ser vê yekê Sultan jî Qazi ra gotiye:

"Ez tucar-mucar ninim. Ez Sultan Bauakas im. Ez hatime vîra, jî bo ku bî çavê xwe bîbinim ka ew gotinên ku derheqê te da dîhatin gotin, rast in yan na. Nuha ez fehm dikim ku ew gotin gîşk rast in. Tu bî rasti jî miroveki geleki bî aqîl û durust î. Bîxwaze jî min, çî dixwazi bîla yadîgara min be jî bo te."

"Ez yadîgaran filan naxwazim," Qazi lê veqerandiye "Sultanê min, pesnên ku tu lî min dîki bes e jî bo min."

## Du Stranên Gel

### NAR GULI

Berevkar SIPAN

Nar guli, nar guli hay  
Nar nar guli, nar guli  
Nar guli, nar guli hay  
Kesk û sorda xemli

Ez çûm baxçê bavê te hay  
Nar guli, nar guli hay  
Sê gul çimin bona te hay  
Nar nar guli, nar guli  
Yek a min e, dudê te hay  
Kesk û sorda xemli

(Girêdan)

Nar guliya Hekaki hay  
Nar guli, nar guli hay  
Çavreşê barê gaki hay  
Nar nar guli, nar guli  
Tu ji min ra malê naki hay  
Kesk û sorda xemli

(Girêdan)

Nar guliya Hertosî hay  
Nar guli, nar guli hay  
Çavreşê çêlekdoşî hay  
Nar nar guli, nar guli  
Cot memikan nafrosî hay  
Kesk û sorda xemli

(Girêdan)

### RINDA MIN

Lê Lê rindê lê rindê  
Lê lê rindê rinda min  
Lê lê rindê lê rindê  
lê lê rindê rinda min

Rinda min çêlek dotin  
Lê lê rindê rinda min  
Golka rêşiyê kon kotin  
Lê lê rindê rinda min



Lê Lê rindê lê rindê  
Lê lê rindê rinda min  
Lê lê rindê lê rindê  
lê lê rindê rinda min

Rinda min çû bêderê  
Lê lê rindê rinda min  
Min xulama şêzerê  
Lê lê rindê rinda min

Lê Lê rindê lê rindê  
Lê lê rindê rinda min  
Lê lê rindê lê rindê  
lê lê rindê rinda min

Min diharê merzela  
Lê lê rindê rinda min  
Heyfa singê çil qerqas  
Dan bin serê keçela

Lê lê rindê lê rindê  
Lê lê rindê rinda min  
Lê lê rindê lê rindê  
Lê lê rindê rinda min



" Ber Kaniyê" - Miranê Oko